

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatolîyê

93  
2025

# bîrnebûn





Tidskriften utkommer 3 nummer per år.  
Çar mehan carekê derdikeve.  
Utges av Apec Förlag AB  
hejmar 93/ 2025  
Ansvarig utgivare: Alî Çiftçi  
Edîtor: Alî Çiftçi, Heciyê Gulê, Muzaffer Özgür

Biha/Pris:  
Europa: 5 Euro  
Türkiye: 30 TL  
Abone ji bo du salan  
Swêd: 400 SEK - Almanya 50 Euro  
Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Koma hevkarên vê hejmarê:  
Alî Çiftçi, Adem Özgür, Hızır Akbina, Mem Xelîkan, Menduh Selim,  
Muzaffer Özgür, Xoyretinê Mihemmedî Seîd, Haneî Celeblî,  
Bêrivan Keskin, Hacî Erdoğan, Hatîce Erdoğan, Smaylê Şêxbizeynî,  
Uskê Cimik, Rojvan Enes, Prof. Dr. Haci Akman, Mehtab İdelî,  
Kübra Uludağ, Xizan Şilan, Şukru Derin, Bêrivan Keskin,  
Mistoyê Heco, Dilan Şewqî, Salih Bozan, Halil Mirzan Küçükyıldız

Medya Kitapevi  
Bekar Sokak No: 7, Giriş kat.  
Beyoğlu / İstanbul / Türkiye

Adress  
Navnîşana li Swêdê  
Apec  
Mjölmarstigen 1  
SE 163 41 Spånga/Sverige  
E-post: info@apectryck.se  
Internet: www.birnebun.eu

Belavkirin / Distribution:  
Ewropa: Muzaffer Özgür  
Bîrnebûn  
Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya  
Tfn: 0049-172 298 24 51

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.  
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tèn,  
sererast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwe diyan  
nayên vegeandin. Ji ber stîl û devokên taybet em  
dest nadin hinek nivîsên nivîskarên xwe.

Numra kontoya li Swêdê:  
(Bîrnebûn) bankgiro: 402-2224  
Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê  
APEC, "Bîrnebûn" Bankgiro-Stockholm/Sweden  
BIC/SWIFT: DABASESX  
IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874  
Çap / Baski: Apec-Tryck AB

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û  
Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

Wêneyên bergê: ji kitêba *Van Kilims Province of Van*  
hatiye wergirtin.

# bîrnebûn 93

ISSN 1402-7488

## 2025

bîrnebûn 93/2025



## Me du hevkarên xwe yên bi qîmet wenda kir

**DR. MEM XELÎKAN** welatperwer, xebatkarê zimanê kurdî, şair û nivîskarekî kovara me yî bi qîmet bû. Ji salên 1970-80î ve di nav DDKD de li ba me xwadî rolekî sereke bû. Ji destpêka derketina kovara *Bînebûnê* heta niha jî yek ji hevkarî herî aktîv bû.

Di 21ê havîna navîn sala 2025an de çû ser dilovanîya xwe.

**MECÎT CİFTÇI** di 1985an de wek penaber hat Swêdê. Ji 1988an heta roja ku nexweş ket jî di Çap û Weşanxaneyê APECê de kar dikir. Li Apecê xebat û kedeka wî ya mezin di weşandina gelek kitêbên kurdî û kovara *Bîrnebûnê* de heye. Û Mecit yek ji wan endamên damezrênerên Weqîfa Kurdên Anatoliya navîn bû. Mecit di 19ê bihara navîn sala 2025an de çû ser dilovanîya xwe.

Bila serê herdu malbatên hêjayên me û gelê kurd sax be!...

Redaksiyona *Bîrnebûnê*

# Naverok

Ji bîrnebûnê	5	Alî Çiftçi
Kek Mecît rûkenê canbega	6	Muzaffer Özgür
Helbestvanê recal	9	Memduh Selim
Doxtorê kurda	12	Muzaffer Özgür
Dr. Mehmet Özsoy, bîranîna te her zindî ye	17	Hacı Erdogan
Mirovekî hêja û dilovan	17	Mehtap İdelî
Gelek xemgîn im...	20	Hatîce Erdoğan
Mem Xelîkan	22	Hızır Akbina
Hamirîye Xelîkan	23	Smaylê Şêxbizeynî
Deziyê dil	24	Adem Özgür
Sirgûnî wekî cîhekî ji bo fêrbûn û bêhnvedanê	26	Prof. Dr. Hacı Akman
Îskana malbeteke Sêfkî ...	37	Hanefî Cebeblî
Kilamên me (XVII)	42	Mem Xelîkan
Gotûbêjek bi Hacı Akman re	44	Uskê Cimik
Berdêlî	48	Hızır Akbina
Hêvîçira	51	Rojvan Enes
Malbat	52	Kübra Uludağ
Çiyayê Sîpanê	52	Uskê Cimik
Embazê mi Kamil Sümbül	55	Şukru Derîn
Rojnivîsk-4	66	Bêrivan Keskîn
Ji bo kesên ku di kelqîja havînê de dicemidin	69	Mistoyê Heco
Ez aşê sebrê me	72	Xizan Şîlan
Muzexana Qazî Mihemed	73	Mehtab İdelî
Tansiyon	75	Dilan Şewqî
Dengê bêdewletîya min - III	76	Xoyretinê Mihemmedî Seîd
Dîroka hunera tevnê, xalî û kurd-III-	78	Muzaffer Özgür
Doza mirinê di destana Gilgamiş de	83	Salih Bozan
Paço	91	Halil Mîrzan Küçükıldız

## Ji Bîrnebûnê

Ji destpêka bihara borî ve me du hevkarên xwe yê qedirbilind wenda kirin: Mecît Çifçî û Mem Xelîkan. Êşa me giran bû. Keda wan herdûyan jî li ser kovara me pira. Mem Xelîkan wekî helbestvan, nivîskar û berhevkarê folklor û çandê ne tenê beşdarekî xebatên hunerî bû, lê belê bi ramana xwe, bi gotinên xwe û bi ramanên jî dilê xwe qada kovar û çandê bi giştî geş kir. Wendabûna wî jî bo me hemûyan ne tenê valahîyeke mezin, lê her weha bingehî ye ku em bêtir li ser şopa wî ya li ser huner, edebiyat û çandê xebatên xwe berfireh bikin.

Bi rêz û bi bîranîn, em vê hejmara nû ya kovarê bi naskirina nav û xebata wî dest pê dikin. Li vir, jî bo Mem Xelîkan û kekê Mecît, jî hewkarên me bi çend gotin û nivîsan em wan bi bîr tînin. Her çiqas mirin bi fîzîkî van hêjayên me jî me dûr bibe jî, ew ê hertim di bîra me de bin.

Di vê hejmarê de Prof. Dr. Hacı Akman bi sernivîsa *Sîrgûnî wekî cîheki ji bo fêrbûn û bêhnvedanê*, jî çend nimûneyên xebatên li dîyasporaya kurdî lêkolînekê pêşkeş dike.

Hanefî Celeblî li ser îskana malbateka sêfkî, bi sernivîsa *Îskana malbateke Sêfkî ji Hüsnü Mansur ber bi Anatoliya navîn*, pirtûka Necip Şahin ku di 1978an de bi navê *Bir Kabile Ailesinin*

*Tercümei Hali ve Necip Şahin'in Hatıratı* dide nasin û şirove dike.

Mem Xelîkan dîsan li ser çanda me ya gelêrî bi sernivîsa *Kilamên me-XVII* kilama *Eskero Yaro* serpêhatîya vê kilamê û herwiha kilama ku hatiye gotin jî arşîva Serbulent Kanat wergirtiye û nivîsiye. Uskê Cimik gotûbêjek bi Hacı Akman re li ser *bîra kurdî* kirîye û jî kovara me ra nivîsiye.

Hızır Akbina, nivîseka li ser *berdêlî*, Rojan Enes helbesteka bi navê *Hêvîçira*, Kübra Uludağ bi navê *Malbat*, Xizan Şîlan bi navê *Ez aşê sebrê me*, Dîlan Şewqî bi navê *Tansiyon* helbest nivîsiye.

Şukru Derîn bi sernivîsa *Embazê mi Kamil Sûmbûl* bîranîneka xwe bi kîrmanckî/dimilî nivîsiye. Uskê Cimik çîrokek bi navê *Çiyayê Sîpanê*, Bêrivan Keskînê bi *Rojnivîsk-4*, kortenovelek, Mistoyê Heco bi sernivîsa *Ji bo kesên ku di kelqîja havînê de dicemidin*, Mehtab Îdelî xeberek li ser avakirina *Muzexaneyê Qazî Mihemed*, Xoyretînê Mihemmedî Seîd rêznivîsa xwe ya *Dengê bêdewletîya min - III*, Muzaffer Özgür bi sernivîsa *Dîroka hunera tevne Xalî û kurd -III*, Salih Bozan *Di destana Gîlgamîş de doza mirinê*, Halîl Mîrzan Küçük yıldız jî bi navê *Paço* serpêhatîyeka xwe nivîsiye.

Bi hêvîya jîyaneka aram heta hejmara tê bimînin di xêr û xwaşiyê de.

Alî Çiftçî

# KEK MECÎT RÛKENÊ CANBEGA


Muzaffer Özgür

**K**êlhesen, gundê jê ba û bajaran berva deşta me tê bû. Lî ser çiya hatîbû avakîrîn. Dema ez kurikbûm ji Kêlhesen mêvanê me dihatin. Dî serê min de mayê jinên salmezin serê wan de kumên mezin, bi kitanê mezin pêçabûn. Paşê min fahm kiribû ku bêhna welat ji cîl û bergê wan têye. Dema ez resmên jinên dor aliyê Semsûrê yê berê dibînim ew jin tên berçavên min. Demekê bi şunde mezin mirin û tekilîya malbatên me qut bû.

Nizanim ew kî ne, lê nîşanek hebû. Zivistana pêşin 1984an de bavê min miribû. Dem derbas bûbû. Li bihara 1985an de ez li gund bûm merîvek bi motirê xwe hat ber mala me. Kelegîrî bû, serxaşî da me. Lê me ew



nasnedikir. Wî jî fahm kiribû û got, ez ji Kêlhesen-Turana me û mixtarê gund im. Me nebihîstibû xalo mirîyê. Xalo! yanê malbata me xalên wan bûne. Çawa? Kînga? Nizanim. Di salên dawî de ji çend kesan pirsî lê, biser neketim ku merlixa malbata me



û ya Turana çawa ye? Di salên pêş da ji gundê Kêlhesen gelek dost û hevalên min çêbûn.

Dema me di sala 1997an de bi weşanxana Apecê re li hev kir û kovar teslîmî wan kir, min malbata Çiftçî naskir. Kek Ali min bihîstibû digotin wî, ciwanên canbegan berva kurd û Kurdîstanê birine û ew kirine hezkirên Kurdîstanê.

Her dem min ji bo karê kovarê telefonî weşanxana APECê dikir. Carcara rehmetî kek Mecît derdikete telefonê, bi zimaneki zelal û xweşik me sohbet dikir. Me hevûdu nedîbû lê dostanîyeka baş hatibû avakirin. Dem derbas dibû...

Em, çend heval ji bo dehsalîya kovarê çûn Swêdê. Ez û kek Vahit lî mala kek Macît bûn mêvan. Me, bi rehmetî kek Mecît û kevanîya wî re sohbeteka xweş kiribû. Bi naskirina wan, min merivên xwe dibûn çî!!!! Xwûna me dikelîya. Ji çend dîtina bi şunde dî navbera me de germihayîyeka qedrbilin çêbûbû.

Mixabin rojekê kek Ali got, kek Mecît gêrbûye û di nexwaşxanê da ye. Ez gelek xemgîn

bûm, gilî kete qirika min lê, ji bo ez moralê bidim kek Ali sebr kir. Her dem min dipirsî. Mixabin ew baş nebû. Sal derbas bûn, demsala da dû hev.

Di bihara îsal de apê min çû rehmetê. Wan rojan de kek Mecît jî rehmetî bû. Min pir xwest ez herim cara dawî xatirê xwe ji kek Mecît bîstînim. Roja defnkirinê ez çûm Kêlhesen û derbasî yayla mala wan bûm. Cimat gehîştibû serhev, jî malê jî dengê şîne dihat. Bi rastî min xwest herim tevî şîna jina bibim û hêstirên xwe lî zozanê birijînim. Jinê me ji bo ziman û hebûna me pir pêşda çûne. Di nav wan de eger şare jî hebe, ji bo şîne, ji bo hêstirên sedsalî lî deşta Anatolîyê dilop dilop birijînim îmkân dibûn. Lê min nekanî. Kek Ali, kek Osman, lavên kek Mecît re me hevûdu hemêz kir. Çi êşeka giranê. Bîstekê bi şunde kek Seyfî jî ji Xelîka– Qerecedaxê hat, em gehîştin hev.

Me kek Mecît oxir kir, pir însan hatibûn ser mezela. Dema binax kirine, me xatirê xwe ji kek Mecît xwest. Heqê xwe

lê helal kir. Ez çûm ba yengê,  
ketîm hembeza dayikê, got,  
Muzaffer! Min got erê ez im.  
Hatim. Em girîyan. Keçika xwe  
hat ez silav kirim. Malbat, dost,  
heval û cîrana ew binax kirin.

Sohbeta wî ya nermik û zel-  
al ji me re ma. Rûkenîya wî,  
dilxweşî û fedakarîya wî ji me re  
bû rêber. Em wî qet jibîr nakin.  
Rehma Xwedê lê be!



Mecît li gundê xwe, li Kelhesen, di 25.04.2025an de hat binaxkirin.

# HELBESTVANÊ RECAL

Memduh Selîm



Dibêjin helbestvan, dengê dil in, ew jana dil gelekî dizanin, dibînin. Li serman, li german dil di çi halî da be, herî baş ew dizanin. Li ber çavan, li ber mejo dil dibînin, hîs dikin. Li dinyayê, li jîyanê weng/wisa mêzedikin. Çavkaniyên helbestan, guhdarîya dil e, deng dayîn û bihîstina dil e. Ava helbestvanan, ji kanîya dil da tê, tîbûna xwe ji wan kanîyan têr dikin. Jîyan bi gotin û helbestên wana baş û xweş dibe. Bê helbest, bê helbestvanan jîyan reş e, tarî ye, ew tu ne jîyan e.

Jîyan bi dil tê naskirin, bi dil dibe kulîlk, bi ziman jî diqîre. Lê zimanê ku dil nasdike, diqîre. Zimanê dayîkê, zimanê pê dinya naskirî û dil bi hev ra diqirîn, rengan vedikin, jîyan ronahî dibe, dilan hişyar dikin. Dil, bi zimanê dayîkê coş dibe, sosin û reyhan vedikin, jîyan weke berbangên sibê zelal dibin. Mem Xelîkan helbestvanekî wisa/weng bû. Ji bo zimanê xwe yê delal, -ji bo kurdî-rengdarîyek bû. Ew helbestvanê zimanê kurdî bû, dildarê kurdîtîyê bû, bi taybetî jî dildarê Kurdên Anatolîyê bû.

Ji bo kurdî, ji bo çand, huner û folklorê kurdên Anatolîyê pir cindî bû. Ji bo Memê dîrok, stran/klam, hekat, çîrok, folklorê kurdên Anatolîyê gelekî girîng bûn. Nedixwest ew wînda û jîbîrbîbin. Xebata xwe yê mezin li ser vê rastîyê bû. Ji vê alî da gelekî jîr/serkeftî bû.

Kurdên Anatolîyê di jiyana kurdî da cîhekî taybet girtibû. Ji bo wî axaftin/dengkirin û nivîsandina kurdî gelekî girîng bû. Wî em tim hişyar û teşvîq dikirin. Nivîsandina min a kurdî û ya gelek hevalan jî bi hîşyarîyên wî bi serket.

Ji bo Memê li hemberê pişavtinê (asimilasyon) hêza herî mezin dengkirin û nivîsandina bi kurdî bû. Di jîyana wî da vê armancê cîhekî mezin digirt. Gotin û nivîsên xwe her tim bi rengê kurdî bûn. Mem, di rêwîtiya jîyana xwe da her tim rêwîyekî kurdî bû. Bi kurdî hat bi kurdî çû. Ew, li dinyayê rêwîyekî weng/wisa bû.

Di salên 2012-2013an da Mem û hevalên din ve em dihatin bacem hev. Memê digot: “Gelê kurd bê dewlet e, bê war e, bê xwedî ye. Eger em dixwazin di pêşerojê de

kurd û zimanê kurdî bijî, ji me re sazîyek pêwîst e/hewce ye. Çanda Kurdên Anatolîyê taybet e. Ji bo wê, divê em komeleyeke Kurdên Anatolîyê ava bikin. Di vê komeleyê da li ser zimanê me, stranên me, dîroka me, çanda me xebatan bikin. Derfetên me jî hene.” Piştî va gotinên Memê, di hemû hevalên me de kelecaneke mezin çêbû. Me li ser vê fikrê/ramanê gelek civîn çêkirin. Li dawîya van civînan, me biryar girt û di sala 2015an de Mem Xelîkan û me bi çend hevalên din ve li Enqereyê KOMKURD-AN avakir.

Xwediyê fikra/ramanê komeleyê Mem Xelîkan bû. Lê mixabin omrê/temenê komeleyê dirêj nebû. Dewletê komele qedexe kir û girt. Mem pir bi ber xwe ket/xemgîn bû.

Jîyana komeleyê kurt bû lê gelek tiştên baş hatin çêkirin û amadekirin. Ez dixwazim di vê nivîsê de mîna keke bidim; Di sala 2016an de li Enqereyê tu kesan ji bo Newrozê çalekî û şênayîyek çênekir. Ji ber ku dewletê çalekîyên weng/wisa qedexe dikir. Em bi hevalan va li komeleyê civîn û Memê li wir got: “Newroz cejna me ye. Ji bo kurdan pîroz e. Ge-

reg e em tişteki bikin. Pêşniyara min, em li komeleyê çalekiyeke çekin. Di vê çalekiyê da helbestên li ser Newrozê hatine nivîsandin ji mêvanên xwe re bixwînin.” Hevalan va pêşniyara Memê çoşekî erê kirin. Di demekê kurt de me amadekarîyên xwe kirin û me bangazî li mêvanan kir.

Salona komeleyê heta dev bûbû, tu cîhên vala neman. Gelek mêvan hatibûn. Memê bername çêkir. Di wê bernameyê da neviyê Maestro Xuco Sinan, giran giran bilûr lêdixist, Memê bi dengekî zelal helbestên Newrozê dixwend.

### Mem Xelîkan

Kak Mem Xelîkan bû,  
Heval Mem Xelîkan bû,  
Hevalekî hêja bû, delal bû, kubar bû,  
Helbestvanê zimanê kurdî bû,  
Kedkarê zimanê kurdî, çand û folklorê kurdî bû,  
Kedkarê Bîrnebûnê bû,  
Pisporê guhdarên zimanê dilan bû,  
Jîyana Memê rêwîtiyeke dîrokî bû,  
Em bi nasîna te, bi hevaltîya te serbilind in, şanaz in.

Lê,  
Bi çuyîna te  
Ez pîr êşîm  
Te deziyê dilê me her tim zîz kir, qetand  
Te em bi tenê hîştin  
Di jîyana me da korteke mezin vekir

Mem Xelîkan

Li piştê me bû,  
Zanayê me bû, bîranîna kurdên Anatolîyê bû,  
Lê xatirê xwe ji me xwest û çû ser dilovanîya xwe,  
Niha li deşta Anatolîyê, li gundê Xelîkan din bin axa sar da razaye.

# Doxtorê kurda

Muzaffer Özgür




Li ser Mem Xelîkan an ji wek Lêpê re dihat gotin Mexmî Sosê nivîsekê amade bikim gelek zehmete. Kesayeta wî ya ji bo ziman û gelê xwe taybetîyên xwe hene. Ji bo çend bîranîn di dîroka me de cîh bigirin ez çend tiştan binivisînim.

Mîna li Konyayê dibistana navîn xelas kiribû û nedizani berdewam bikim an jî wek her kesî herim Avrûpa. Lê min biryara xwe de û roj û seeta dawîye qeyîda xwe li Kulu Lîsesîye kir.

Faşizma îlonê hatibû û her der dibin çavderîya lêşkeran de bû. Rojekê rehmetî Miçê Êsê (bi rêzdarî bibîrtînim) ez birim ba doxtorêkî, li lewha wî dihat nivîsîn Dr. Mehmet Özsoy. Em bi hevûdu dan nasîn. Ji wê rojê bi

şunda heta roja mirina wî tekîliya me 45 sala qet qut nebû.

Mem doxtorêkî gelek hêja bû, carcaran ez diçûm cem wî. Dema nexweş dihatin siftê pê re sohbet dikir, êşa wî, pîrsa wî dibîst, ew derbasî hundir dikir û dema derketin salona pêş jê çend kes dipirsîn. Hekat û kenokên gundê wî jê dipirsîn. Min bi xwe dîye ku bi nexweşê xwe stran an ji hekata stranekê pê gotin dayê. Wek Derûnnasekî nexweşê xwe re mijûl dibû. Kesê nexweş û bi êş hatî hîn baştir derdiket diçû. Rojekê em li ba wî rûniştibûnî kesek hat, rewşa xwe ne baş bû û solix nedigirt, nale nal bû. Ew derbasî alîyê din kir dema ji hundir derketin pê re got, “Heso, greg tu herî Ankarê nexweşxanê ma dr. Dil



li te mêzeke.” Heso, li çavên me mêzekir. Got, “Perê min tunen, ez çing herim Ankarê, tu halî min dizanî, ez herim gund, xercelix-weka xwe bibînîm ez ê so herim Ankarê.” Gote wî kesî, “Nabe, ez pera bidim te, niha her Ankarê.” Derbasî oda din bûn. Ew amade kir û bişîne, gotê, “Tê vê carê ji min re ew kilama min ji te dixwest berhev bikî.” Bi vî şiklî bi hezaran kesî re tekilîya xwe ava kiribû û ji boyî herema me gelek agahdarî berhev kiribûn. Buroya wî de her roj bi nivro şunde sohbet hebû.

Nexweşên pere xwe tunebûn xwe lî wî digirtin. Qet behsa pera nedikir. Dilgermîya wî, aqilmendîya wî tesîreka pozîtîf dinav ciwata me de cîh girtibû. Dinav kurdên me yên li Kuluyê niştecih bûn de jî keseyatîya wî taybet bû.

Di nav refên DDKD de cîh girtina wî roleka sereke dilîst. Pir kes, heval û siyasetvanê me re tekilîya xwe hebû. Dida distand. Di helbijartina sala 1987an de li Konyayê roleka sereke list û endamên me kurdan di dawîya helbijartina pêş ya nav endamên partîye de cara yekemîn cihê sereke qezenç kirin. Partîya me we deme SHP bû. Serokê partîyê jî Erdal İnönü

bû. Endamên me biserketin û rehetî Fehmi Demir (bi rêzdarî bibîrtînim) cihê yekemîn, rehetî Murat Bozlak jî bû bû duyemîn. Bi kelecana hemû alîyan bi şewketin nav kar û barê helbijartinê. Kelecaneke pir baş hebû li herema me, kurdên me bixwe bûbûn endam û mer, jin, xort û keçik—bûk dimeşîyan tevî mîtingan dibûn. Mixabin me gelek deng jî girtin lê li Konyayê biser neketin. Ew kelecana û motîvasyona ciwanê me, em heta hîro jî anîn. Tê zanîn di sala 1989an de jî em ji partîyên tırka bidûr ketin...

Doxtir tesîra xwe lî ser pir kesan çebû. Min pir li ber xwe dida ku ma ew derkeve pêş lê qebûl nedikir. Digot, “veng hîn baştire, ez alîkar bim, binivîsînîm, kar bikim lê derketina min a pêş baş nabe, tendurîstiya min ne baş e.”

Sal û demsal diheriqîn, rojeka ji roja ez li gund bûm û telefonê mal lê ket, kesekî got, “Xoce, sibê seet şeşên ber êvarê were garajê Kuluyê em hevûdu bibînin.” Ew dem hat û ez çûm Kuluyê. Ew kesê telefonî min kiribû amade bû. Em li arabê sîyar bûn û min got, “kuda bajom kekê” gote min, “bajo ...” Ez şaş bûm çî bêjim. Em çûn û ji arebê


peya bûn. Min bixwe bixwe got, “halla halla, ew çi hale, em çima hatin vir? Kelecaneke jî bi min girt. Mala Sosê li vir e, ew çi hale? Xwedê!”

Li dawîyê em hatibûn mala Kek Mem Xelîkan. Bi dengê nizm û germ û bi ken em xêrhatî kirin. Lê ez di şokê de bûm. Derbasî salona malê bûn. Xoş, başî derbas bû bi şunde ji bo ku şoka min derbas bibe hevalê ji bajêr hatî dest bi xebirdanê kir. “Xoce, Mem hevalê me ye, demeka dirêj e me dixwest we bi hevudû re bidin nasîn. Mem her dem li piştê te bû, em dizanin. Lê dem hat û hûn hevûdu nas bikin.” Min fahm kir ku Mem Xelîkan rêhavalê min bûye. Ez ji cîhê rûniştim daketim erdê û keke girî bûm. Fişke fişka min zêde bû, eciz bûm ku çima heta van rojan çavkirine ku me bi hevudû bidin nasîn. Sos, hat kêleka min, di pîyê min re girt û gote min, “magî te çi fişke fişke tu naxwazî em bibin rêhavelê hevûdu? De rabe li ser koltixê rûne!” wan henekê xwe bi min kirin, bi min kenîyan, min nedizanî ez şa bim an eciz bibim. Min fedî kir. Ji şokê qet neprofesyonelî helwest girtibû.

Me, di salên 1993/4an de di nav partîyên legal de cîh girt. Pirs gelek bûn, lê me berxwe dida. Ji ber ku kek Murat Bozlak (bi rêzdarî bibîrtînim) serokê partîyê (HADEP) bû ez diçûm dihatim. Mem jî nêzî kek Murat bû. Me çend caran li petrol jî hevûdu dîtî çêkirin.

Di sala 1994an de me li ser Kurdên Anatolîyê sohbet dikir. Em çi dikanin bikin? Arşîv, berhevkirina stran, hekat, gotinên mezina ûyd. Hevala gotin me, “hûn biserê xwe ne. We çi biryar girt em pîştgirin” Rojekê me biryar da ku em civînekê bikin. Li Kuluyê me bi çend hevalan va civînek çêkir. Li dawîyê me biryar da ku em bûlteneka bi 4 rûpela derxin û belav bikin. Em ketin nav kar jî. Rewşa welat gelek jî xirab bû. Her roj mirin zêde dibûn. Li dawîyê em bi ser neketin!

Rojekê Memê gotê min. “here Ankarayê li Partîyê hevala bibîne û kek Murat zîyaret bike. Ez çûm. Me da û sand. Sohbet kir. Dema li oda kek Murat bi tene manî gote min, “Tu çima vegeyîyayî welat, ji bo te gelek xetere. Xweska tu nehatabûyî!” Min xwest çend gotina bikim, tilîya xwe da



ser lêvên xwe û îşmarî min kir ku ez dengnekim. Qelem heyne dest xwe û li kaxizê nivisand. “Demeka kin de ji welat derkeve, Memê te agahdar bike.” Ez şaş mabûm. Min qet deng nekir, fahm kir, dibê ku oda wî tê guhdar kirin.

Em pê hêşyanî ku ji kuştina Faîk bi şunde biryar hatîyê dayîn ku li Anatolîya Navîn ji bo tirsana nav gel de zêde bibe kesekî din bikujin. Di nav wan kesan de navê min jî hebûye. Min xwe amade kir û nîsana sala 1995an de ji welat derketim û li Avrupa bûm penaber.

Li Avrupa bi gelek kurdên me re tekilîyên min çêbûn. Li dawîya çend hevûdu dîtina, me biryar da ku em ji bo kurdên Anatolîyê kovarekê derxin. Min bi kek Hacî re got, dema tu çûyî welat here Kulyê Dr. Mehmet Özsoy bibîne. Wer jî kir.

Mem Xelîkan di destpêkê de bi navê Mehmet Şîrîn Dağ dinivisand. Du re bi du nava berdeyam kir. Dest û pîyê me yê li welat bû. Çavkanîya me bû. Xezîna kurdên Anatolîyê bû. Bi îrsar li ser ziman disekinî û digot, “eger ziman hebûna meye gereg em bi kurdî binivîsinin û kurdîya xwe pêşda bikin.” me, wer jî kir.

Rojekê got, “ez dixwazim helbestên xwe wek pirtûk belav bikim.” Me li hev kir. Dîsa barekî giran da ser mile min. Min hemû helbestên wi berhev kirin û wek dosya jê re şand. Li dawîya kontrola wî me teslimî weşanxana me APECê kir. Bi alikarîya Bîrnebûnê û APECê helbestên wî bûn pirtûk, “*Şevbider im.*”

Her dem tekilîya me hebû. Mala xwe jî barî Ankara kiribû. Li Ankarayê dostên gelek heja anîbûn dor hev û dema em diçûn welat, me bi wan wa hevûdu ziyaret dikir. Hebûna wan moral dida me. Ma sax bin.

Disa min helbestên wî dan ser hev û kirin dosyakê, çap bû. “*Serenad*” Daxwaza wî hebû ku nivisên xwe bike pirtûk. Ew kar ma, lê jîyan berdeyam e. Em li ser rêya xwe ne û em ê berdeyam bikin. Lê, solixa me ya li welat kêmbû.

Çend roj in ji ber êşa giran li mal dinav cîha dabûm. Min bihîst ku Memê li mal krîza dil derbas kirîye û çûyê rehma Xwedê. Min heval agahdar kirin, bawer nedikirin. Min ji kek Levent re telefon kir lê me herduya jî nekanî deng bikin, girî û şîna me giran bû. Ez

di cîya dabûm, êşa min zêde bû.  
Xweska ez biçûyama welat, rewşa  
min xerab bû, min şîna xwe dinav  
cîhê xwe de kir.

Gelek heval û dostan telefonî  
min kirin, xemginî û serxaşî  
dan. Ma xaş bin. Agir bi mala  
bîrnebûnê ketibû. Bi sedan kesan  
xwe dan rêya Xelika, ji durva  
min seet bi seet agahdari digirtin.  
Doxtor Mehmet Özsoy, Mexmê  
Sosê, Mehmet Şîrîn Dag, Mem  
Xelîkan bi çavên şil hat binaxkirin.

Cîhê xwe behîşt be, Oxir be  
kekê, rêhavalê min. Tu qet neyî  
jibîr kirin. Kar û barê te ji bo gele  
xwe kir hêja bû. Serê malbatê, ko-  
ma bîrnebûnê, heval, hogir, cîrana  
û Kurdên Anatolîya Navîn sax be.



Dîmenek ji binaxkirina, Mem Xelîkan li gundê xwe, Qerejdxê Foto: H. Camgöz



# Dr. Mehmet Özsoy bîranîna te her zindî ye

Hacî Erdoğan

**DR. MEHMET ÖZSOY** min bi taybetî nenasîbû. Nasîna min bi wî re di sala 1996'an de, li navçeyên kurdan ên Anatolya Navîn pêk hat. Wê demê li her derê Kurdistanê û li derveyî welat, gelê Kurd li ser piyan bû. Gundên Kurdistanê dihatin şewitandin, rêxistinên çandî û çandvanên Kurd dihatin binpêkirin û kuştin. Lê belê gelê Kurd jî dest ji berxwedana xwe ya ji bo azadiyê berneda û xebata xwe domand. Di wê demê de hejmara şehîdên Kurd bi hezaran dihat gotin. Diyar bû ku kurdên Anatolya Navîn jî di nav vê berxwedanê de cihê xwe girtibûn. Li her devera Anatolya Navîn, ciwan û keçên Kurd bi xwîna xwe şehîd bûbûn.

Kurdên Anatolya Navîn bi nasnameya xwe derketin pêş û ji bo parastina nasnameya xwe di nav şer û têkoşînê de bi hêz xebat kirin. Beriya wê demê, rewşenbîrên kurdên Anatolya Navîn di nav

partî û tevgerên kurdistanî de têk çûbûn. Lê belê der barê dîrok, çand û rewşa kurdên Anatolya Navîn de heta sala 1996'an tiştekî pir kêm hatibû nivîsandin. Tenê Apê Nuh Ateş li ser dîrok û çanda kurdên Anatolya Navîn nivîsîbû, û ev jî karekî serketî bû. Lê divê bêtir tişt li ser kurdên Anatolya Navîn bê nivîsandin û çand û kultura wan bê belavkirin. Mixabin, heta wê demê tiştekî zêde derneketibû holê.

Hevalan ji bo derxistina kovarekê civîn çêkiribûn, lê ez ji vê yekê bê agahî bûm. Min dest bi lêkolînan kir da ku em bikaribin kovarekê ji bo kurdên Anatolya Navîn derxînin. Piştî ku gotara min a li ser kurdên Anatolya Navîn di rojnameya Özgür Politîka de hate weşandin, bi sedan xwendekar telefon kirin, peyama şandin û xebat bi pêş ket. Piraniya wan jî kurdên Anatolya Navîn bûn.

Min biryar da ku em kovarekê ji bo kurdên Anatolya Navîn derxînin. Di destpêkê de, min bi Mehmet Bayrak, Apê Nuh Ateş û çend hevalên din re li ser vê mijarê gotûbêj kir. Wan piştgirî da min. Piştî vê, me îlana derxistina kovara Bîrnebûn da. Di rojnameya Roj de jî ev yek hate ragihandin. Hevalê me Îhsan Türkmen îlana dît û ji Stenbolê telefonî min kir. Ew li rojnameya Rîya Azadî dixebitî û di rojnamevaniyê de xwedî zanîn bû. Îhsan bi xwe dilxwaz bû û got: “Derxistina kovarekê pir girîng e, divê ev bê kirin.” Me li Stenbolê hev dît, hev nas kir û bi hev re çûn Ankara, Konya-Kulu û Kirşehîr.

Li Ankara me bi Fatîn Kanat, li Kulu bi Mustafa Taşçi û Mehmet Özsoy re civîn kir. Miçê – yê rehmetî – got: “Ez ê ji bo kovarê alîkariyê bikim.” Ax Miçê, te jî bi canê xwe ev xebat kir! Germahî û dilsoziya te, Miçê, ez qet ji bîr nakim.

Piştî vê, em çûn ba Mehmet (Mem Xelîkan). Havîn bû, germa bû. Mehmet li ber buroya

xwe, li mûhaneya doxtoriya xwe, rûniştibû. Cixare dikşand. Min jê re got: “Em dixwazin ji bo kurdên Anatolya Navîn kovarekê bi navê Bîrnebûn derxînin.” Îhsan bi coş got: “Divê ev kovar bê derxistin.” Mehmet jî got: “Derxistina kovarê tiştêkî rast û bi hêz e. Her tiştê di destê min de hebe, ez ê bikim û navê min jî di kovarê de cih bigire.”

Ev Memê Sosê bû. Mehmet ji destpêkê heta dawiyê bi xebata xwe, bi hevaltî û nivîsên xwe, wekî birayekî mezin, kovara Bîrnebûn saz kir. Piştî derketina kovarê, wî her dem rewşa her kesî dipirsî û moral dida.

Naskirina Mehmet Özsoy (Mem Xelîkan/Memê Sosê) ji bo min rûmeteke mezin e. Ez ji Xwedê gelek spasdar im ku ev şans da min ku min ew nas kir. Mehmet pir zû çû, lê me ew pir hez kir. Xebat û nivîsên wî ji bo kurdên Anatolya Navîn her dem dê bijîn.

Birayê bi rûmet û hêja, cîhê te ronî be, mekana te bihuşt be. Em tu carî te ji bîr nakin. Bîrnebûn te bîr nake.



# Mirovekî hêja û dilovan

Mehtab Îdelî

Nivîsandina li ser hen kesayetiyan dijwar e. Mirovên weng hene ku wekî çiyayên bilind in. Wekî çiyayên Kurdistanê. Yek ji wan mirovên qedirbilind û hêja jî Mem Xelîkan e.

Kek Memed kesekî bêdeng xuya bû, lê dema mirov ew nas dikir, te yê yekser dilê wî yê mezin li pişt helwesta wî ya bêdeng bidîta. Di bin ew helwest û dîlnizmiya wî de xezîneke mezin verşêkirî bû. Ew, him wekî di jiyana xwe ya tazbet de him jî di derbara çand û zimanê xwe de kesekî zana û xudî zanyar bû. Nêzikî 30 salan helbest û gotar bi zaravayê kurdî yê Anatoliya Navîn nivîsandin. Her gotin û her riste ji dil û ruh derdikirin. Ew hewldaneke parastina çand û zimanê xwe bû.

Me çend sal berê cara yekem li Enqerê rû bi rû hevdu dîtibû. Çend saet sohbet bes bû, ku ez wî ji bo tevahiya jiyane nas bi-

kim. Digot ku, divê ciwan ber bi lêkolînên ziman û çandê va werin arastekirin û di wan waran de bixebitin. Dû re li ser lêkolînên min ên li ser ziman û çandê pirsî. Her ku min qal kir, kêfa wî bêtir hat. Digot, “ez her dem amade me ku alîkariya te bikim, tenê tu berdewam bike.” Min berdewam kir û wî jî gelek alîkarî.

Dema te tiştêk dipirsî, wî ji kift-riza xwe/jidil alîkariya te dikir. Ne tenê bi zanîna xwe, bi tecrubeyên jiyane jî rêya mirov ronî dikir. Bi dilovaniya xwe ya bêsinor, bi bişirîna xwe ya ku ji qet ji rûyê wî nahere, bi rawestana xwe ya pak û rast û bi alîkariya xwe ya bêdawî - wî wekî mirovekî netêneşo di bîr û bîranînên me de cih girt.

Bîr û bîranînên wî, gotar û helbestên wî ji me ra mîrat man. Rêya wî rêya me ye. Em ê tevna wî ya neqediyayî, ji cihê ku hiştiye de berdewam bikin û

bidomînin. Em tu carî wî ji bîr  
nakin û navê wî her tim di dilê  
me de bijî.

Eger wî niha bibihîsta, min ê  
bigota, kek Memed, xwazke min  
qet tu nasnekiriba; îro dilê min  
ewqas nediêşa. Te omdiya me, om-  
diya koma bîrnebûnê bi tevahî birî.  
Pişt ra min ê bigota, ez pir kêfweş  
im ku min di jiyana xwe de kesekî  
bi qasî te hêja û bi qîmet nas kir.  
Ew ê bişirîya û bigota, Mehtab, de  
êdî bese qerara xwe bide.

Behskirina te bi hezaran rûpelan  
xelas nabe, lê ez a îro şora xwe qut  
bibirim. Dizanim tu westiya yî.

Em ji bo tiştên ku te, ji bo gel û  
welatê me kiriye spasdard in.

Rêya te ronî be û ruhê te şad be,  
kek Memed!

*“Mirov bi xebat û dilovaniyê  
nasnameya xwe çêdike. Dr. Mem  
Xelîkan jî wer kir û navekî xaş li  
paş xwe hişt.”*



## Gelek xemgîn im...

Oxir be!

Helbestvanê hêja,

Oxîr be, Kekê min ê ezîz.

Îro, Kurdên Anatolîya Navîn, Erebe zîmanê xwe wenda kir; çû  
dîwane xûdê.

Bi xatirê te keko.....

Me, xwe li hemêza te digirt,

Tu zîmanê dayikê,


Tu bîranîna kurikbûna me,

Tu helbest bûyî.

Oxir be,

Parastvanê zîmanê dayikên me,

Tu antolojîya narînîyê, sadebûn û rindîya.



Zeman, wek mîna zaneyekî,  
bêdengîya xwe lî helbestên xwe nexş kirîye  
Lê ez, destên xwe bi şopên hîyêroglif ên li ser kevirên mejûyê xwe  
de kolandin dikim.

Dixwînim di hundirê xwe de, bê deng,  
wek ji te ra kilameka Şînê distirêm...  
Yek bejî dû şopên kêlîmeyên kurdî ketî bi ked û fedekarî  
Agahdarîyên pê hêsîyayî, hînbûyî, bê berdêl te bi me re parva kir  
Bêdawî mînettaram kekê min.

Di ber her nivisên ji bo bîrnebûnê nivisandin  
Ji bo ku te, ez wek mîna kelecana roja yekemîn, kirim  
pêşçavderîyên xwe spasdarim.

Oxir be, keseyeta qedirbilind  
Oxir be, qet ji dil nedişand, merivê rind

Ma serê malbatê, heval û cîrana sax be,  
Serê Kurdên Anatolîya Navîn sax be.  
Ma serê koma kovara bîrnebûnê sax be.

Bi xatirê te,  
Derwîşê zimanê me.....

Hatîce Erdoğdu/Kırşehir

(Not: Ev nivis ji tirkî hatiye wergerandin– Redaksiyon)



# Mem Xelîkan

Hizir Akbina

Goristana Xelika mevanakî te hat ji te neyî zêde  
Wî eslê xwe înkâr nekir, ew î helal zêde  
Rabe wî di axê xwe de veşêre  
Yî sawalên xwe bi kurdî bidê zêde zêde

**M**em heval û cîranê min bû. Min Mem bi gotinên kurdî naskir. Memê jîyana xwe ji zanîngehê de hata roja ku çû ser dilovanîya xwe ji kultura kurd, ji zimanê kurdî re serf kir.

Mem ferhenga kurda bû. Wî dema peyvik dibîst li ser wê dadi-vestîya ew ronî dikir.

Xwedîyê kultura kurda bû, çi edet, kevneşopî, gotin, pêkenok, devok, kilam, çîrok, gotinên mezina hebûn gîştik yek bi yek berhev dikirin û dikirin nav arşîva *Bîrnebûnê*.

Taybetîya xwe ye mezin, yî hozan bû, helbestên wî li Amadê di Newrozê de hatin xandin. Helbestên wî bûn kilam û dinav kurdan de belav bûn. Mem kesekî fedakar bû, kesekî dikanî însan bi rexistin dikir bû. Wê demê bange me kir, got; „werin em ê ji Kurden

Anatoliye Navîn re komalekê çekinî.“ Heval û hogir amade kirin anîn ser hev. Me li paytaxta welat Ankarê, *Komkurd-An* ava kir. Kurdên doralîyê me dawet kir. Piranîya me hevûdu li vir naskir. Em hatin cem hev, Hevala dest dan hev û kar û barê xwe kirin. Li ser ziman û kultur a kurda, li ser politîka kurda me di sayê Memê de pîr tîşt evisî.

Bîrnebûn Memê bi min da naskirin. Rojekê got; „Xizir ez xeberekê bidim te, em ê kovarekê derdixinî.“ Min pirsî; „Mijara xwe çi ye?“ Gote min, „Ji bo Kurdên Anatolîya Navîn, li ser ziman, wêje, dîrok û yên din nivisa belav bikin.“ Wî ez motîve kirim û min ji kovarê re nivis amade kirin.

Me zane û entellektuelekî mezin wenda kir.

# Hamirîye Xelîkan

## Smaylê Şêxbizeynî

Xebere xiraw zû rîyay. Apê Mem Xelîkan mirdigê. Naw zikkiman sûzant. Diliman fire zîz wû. Ra kurdên Anatolîyê Navîn mamosteye zwanaman mek kirdin. Ra gîştîman hamirîyî baş wî. Bîstû penç sal ve yek hamirîtî kirdin. Rujî yekitinî neşikandîn. Rujî xirawî, kisse xiraw je ejnafittim. Hertim xasiye le seriman wû. Fire xweşê dihat we şêxbizeynîgel. Min je gozgoz wîm, ewî jê qerecirag (Xelîkan) wî. Deyeliman nezîkî yek wî. Dîçîyan we tezîyeki yekitinî.

De sal ver je ye hattin ve hendim. Vitin qe komeleyek ra kurdên Anatolîyê Navîn da okerin. Dixwas-tin ke min jî de navevan wim. Je naw şêxbizeynîgel min xwastin min qawu-le kirdim û fire şawîm. Rujî veyeko çin lê şûn digerdîyan. Lê şûnî cîhe rind dîn ra komeleman.

Xwandi şûna je man pirsîya, “Navê komelatan çî ye?”

Îme jî vitin ke “KOMKURD-AN e”.

“Meqsedê komeletan çastin?”

Îme jî vitin ke le ser kurdên Anatolîya Navîn e, le ser zwana û hunereman xwavindatî derkevîn. Es-ta ve serpa û we man vit ke.

Je sevr'e îre re destiman mage, îwe ji dikerin qe ew jî destiman visanin.

Qere girt û esta çî. Şûna ne ra we man. Mem Xelîkan vit ke, “Heman je man ditirsin. Rûyaman rast e.” Îme şûnaydik dîn û komeleman okirdîn. Apê Mem fire şa di vîya. Fire dixwast ke kurdên Anatolîyê bila wan hendi yek. Qederawan yek e, de naviman cigîtî hijne wî.

Mem Xelîkan kurmancîye fire baş wî, herkesî je wî dipirsî ya. Guranî çîngeliman (hunermend) qe kissey ne zanistin tim je wî dipirsîyan xas di-zanist. Ew jî tim je min dipirsîya. Je dewlemendîye zwanaman fire şa di wî ya Apê Mem Xelîkan ra herkesî fire nezîk wî. Nuxaşgeli kurmanç gîşte diçîyan we hendi wî. Lê gazî herkesî dihat.

Min û Mem Xelîkan tim diçîyan we serxweşî, sûr, dawet, şor kurdên Anatolîyê Navîn.

Tim divit, bari şêxbizeynîgel gi-ran e. Bari kurdên Anatolîyê Navîn le ser îwe tup wî ye. Fire kiyet dira we îme. Le herşûn we zwana xuman kissa kirdinaman fire xweşa dihat we.

Şûnay wî kesî negirî. Tim da re Vîriman wû. Hamirîyî fire baş wî. Cîye cennet wû.

Oxirê xêr wû.



# Deziyê dil

Adem Özgür

Pir gotinên me hene ku ne mîna gotinên deverên din in. Gotinên gundên me ne, ji xwe berê têne zimên. Dema ku dikenin, digirîn, hêrs dibin an jî ditirsin, van gotinan têne ber zimanê me. Ez van gotinan nikanim bi Tirkî yan jî zimanekî din bibêjim. Mîna "deziyê dilê min qetî" yan "qediya".

Dema ku em ji kesên ku hez-dikin dûr dibin, ev peyv tim li ber zimanê me ye. Telefonekî dereng lê dikeve, telefonekî li ser hev lê dikeve yan jî peyameke bi "te bihîst" dest pê dike - deziyê dilê me diqetîne.

Roja Mem Xelîkan mir, xalê min Mizaffer li min geriya û got: "Te bihîst..." Dema xalê min peyva "doktor" bi nav kir, min fehm kir ku qala wî dike.

Wê wextê deziyê dilê min qediya bû.

Li welatê xerîbiyê tirs her roj li ber dilê me ye. Tirsa mirina

kesên nas. Kesekî nas li welêt bimir, em ê çi bikin, li kê bigerin?

Min ji heval û dostên hevpar re telefon kir. Min nasên hevpar re peyamên ku bi "te bihîst" dest pê dikirin şand. Me êşa xwe li hev parve dikir. Kekê Levent Kanat dilê min pir zîz kir. Ew va panzdeh salên dawî de li ba hev bûn û gelek fikrên wan ên bo KANê hebûn. Kek Levent digot, "qenebe 5-6 salên din bisekina, pir zû çû!"

Xwaska...

Mem Xelîkan - yan jî bi navê wî yê li gund, Mamê Sosê - 25 sal in nas dikim. Dema ku ez kurik bûm, di jiyana me de bû. Doktor û dostê malbatê bû. Dê û bavê min, anka min a rehetî Xayça Meyrikê diçû ba wî, tedawî dibû.

Her ku zeman diçû û tekiliya min a bi kurdî re geş dibû, min helbest û nivîsên wî yên di korvarê de dixwend. Şewq û îlham didane min.



Tekiliya me ya dostanê li Enqerê çêbû. Ez wê demê di rojnameya kurdî de dixebitîm û kek Mem ez dawetê komeleya KOMKURD-ANê kiribûm. Xeyalên min ên zarokatî li wir hatibûn cih. Êdî min bala xwe dida kar û barên kurdên Anatoliya Navîn. Min gelek kesên bi rûmet û rêz nas kirin, tekiliya min a bi wan re gelek baş dibû. Lê sohbetên min ên bi kek Mem re her tim cûda bûn.

Em çend xortên di komeleyê de bûn û em teşwîqî nivîsandin û xwendina zimên dikirin. Wî dixwest di KOMKURD-ANê de karên arşîvan, berhevkirina klam û gotinan bikin. Ji xwe wî van karan dikir, lê ji me jî dixwest beşdarî bibin. Dizanî ku ji bo çand û nivîsandina kurdî pêdivî bi xortan heye.

Enerjiya me ne wek enerjiya wî bû.

Me bi hev re gelek panel bi cih anîn. Me li ser gotin û klaman deng dikir. Di civînên komeleyê de me li ser pêşeroja KANê

nîqaş dikir. Me him kêfxweşî û hêvî, him jî tirs û êşên xwe di-anîn zimên. Ne tenê li komeleyê - min li qehwexaneyê jî xwe dida kêleka wî. Doktor, wek kesekî ku muayene dike, ewqes ciddî xet dilîst ku me nediwirê dengê xwe bikin. Gelek ciddî bû, lê ev ciddîtiya wî, ya li ser lîstikê bû, paşê dest bi ken û henekan dikir.

Hefteya ku ez werim Ewropayê, min çû xatirê xwe ji hevalên komeleyê xwest. Yek ji wan jî Mem Xelîkan bû. Me hevdu dîsa li qehwexaneyê dît. Me gelek wext derbas kir. Dawiya sohbetê me, ji min re bi dengêkî giran got: “Adem, tu jî çûyî, xort namînin. Piştî komeleya me, her kes giran giran belav bûn. Şûna ku tu çûyî bini-vîse, tekiliya xwe ji me nebire. Hûn ji me re lazim in.”

Em bi wan lazim bûn, lê mirina wî jî zû bû. Hê ew bi me lazim bû. Wekî ku digot, çîrok û klamên me li hêvîya wî bûn!

Mirina wî ya bi krîza dil dezîya dilê me qedand.

# Nimûneyek ji dîyasporaya kurdî: Sirgûnî wekî cîhekî ji bo fêrbûn û bêhnvedanê

Prof. Dr. Haci Akman

## **Pêşgotin:**

Sirgûnî bigiştî bi windabûn, nebûn û dûrbûnê ve girêdayî ye – jiyanêke li durî cihûwarê xwe. Lê ji bo gelekî kurdên li dîyasporayê, sirgûnî di heman demê de bûye cîheke raman, tevger, afirandin û vejînê. Sirgûnî li hember tepeserkirin û astengkirina derbirînên çandî, siyasî û zimanê dayikê rê û derfetên nû li parastin, pêşxistin û xurtkirina nasnameya kurdî re vekiriye.

Gelê kurd di cîhanê de yek ji wan gelên mezintirin ya bêdewlet e ku li ser axa xwe ya xweser bi dehansalan di bin zefanî û qedexeyên giran de dijîn -bi taybetî li Tîrkiye, Îran, Iraq û Sûriyê- pêşî li hember raman û hizrê azad, derbirîna

çandî, rexistinkirin û pêşxistina zimanê dayikê û sazîyên siyasî hatiye girtin û qedexekirin. Ev jî bûye sedema ku bi milyonan kes bineçarî dev ji mal û warê xwe berdin û li welatên ku hatine sirgûne bi cîh bibin, bi taybetî jî li welatên ewropî yên wekî Almanya, Swêd, Norwêc, Hollanda û Îngilistan.

Ev nivîs vedikole ka sirgûnî bi van ezmûnan ve çawa dikare bibe him cîhê fêrbûnê û him jî cîhê nefesgirtinê – cîheke ku bîranîn, ziman, huner û dîrokên kolektîf ji nû ve vedije. Weke mînakek dîyasporaya kurd ne tenê weke encama bindestiyê, di heman demê de di avakirina nasname û berxwedanê de weke îmkaneka stratejîyek tê nirxandin.

**Li sirgûnê pêvajoya fêrbûnê:  
Ji nû ve vedîtin, ji nû ve  
avakirin û berxwedan**

Sirgûnî ne tenê ji hêla erdnîgarî ve di heman demê de ji hêla çandî û rewşenbîrî ve jî ji bo gelek kurdan temsila destpêkeke nû ye. Sirgûniya li welatên wekî Swêd, Almanya û Norwêcê bi tersê têkiliyên bi serdestên weke Tîrkiye, Iran, Iraq û Sûriyê rê û li derfetên ji bo lekolîn, parastin û vejîna ziman, çand û nasname ya kurdi vekiriye. Ev pêvajo ne tenê berde wama jiyane bû, di heman demê de bi awayekî çalak ji nû ve vejîna dîrokî ku

gelek caran rastê hewildanên tûnekîrîne hatî bû.

Yek ji nimûneyek berbiçav tevgera kurd ya li Swêdê di salên 1980 û 1990î de ye. Swêd weke civakeke vekirî û demokrat derfetên maf û azadiyên ku kurdan heta niha nikarî hizirbike da kurdan. Kurdên li sirgûnê dest bi avakirina saziyên xwe kirin, weke mînak saziyên navendên çandî, dibistanên dilxwaz, pirtûkxane, weşanxane û çapxaneyên weke APEC û nemaze karê medyayê. Kovarên wekî *Berbang* û Roja Nû ku bûne platformên girîng



Bergen -Norveç, 2014

ji bo pêşxistina ziman, wêje û analîzên siyasî yên kurdî, û paşê jî medyaya dijîtal wekî Nûdem, Kurdistan24 û medyaya civakî di mayîndebûna vê pêvajoya fêrbûnê de roleke navendî lîstin.

Aliyek girîng a vê pêvajoyê têkilîya zarok û ciwanen kurd

ku li sirgûnê ji dayik bûne û li wir mezin bûne bi mîrata xwe ya kurdî re çawa ye . Gelekî ji wan zimanê kurdi ne li mala xwe li dibistanên şemiyê ku ji aliyê dêûbavan, çalakvan û mamosteyên dilxwaz bi ked û hewildaneke bihêz ve ji bo



Bergen -Norveç, 2014

parastina ziman û çandê têne birêvebirinê de fêr dibin. Her wiha musîk, helbest, govend û çîrokbêjî ku elementên bingehîn ya perwerdeyek nefermî nin û ne weke dibistanên fermî tên birêvebirin, lê di perwerdeyê de elementên gelek bibandor, kûr û watedar in. Stranên hurnermendên wekî Şivan Perweran jî helbestên Cegerxwîn, ne tenê derbirinên çandî ne, lê di heman demê de amûrên pedagojîk ji bo avakirina têgihîştina ziman, hişmendiya dîrokî û aîdiyetê ne.

Tiştê ku vê pêvajoya fêrbûnê bêhempa dike ev e ku ew bi piranî xwe bixwe birêxistin kiriye û ji hêla pêwistiyeke kolektîf ve ji nû ve avakirina nasnameyek ku bi zilm, qedexekirin û sirgûnê ve perçebûyî, tê birêvebirin. Sirgûn li berûvajîyê welat ku li wir Kurdî qedexe bûye, marjînalîze bûye û hatiye bişaftin, bûye cîhê raman, tevger û berxwedanê. Li vir mirov dikare çîroka xwe beyî ku bineçarî li goriya sansurê an jî li goriya dewletek ku dixwaze civakê li goriya esasên avakirina netewekî bi sazbike formule bike.



Di vê çarçovê de têgihîştina teorîsyenê çandî Stuart Hall ya li ser nasnameya diyasporayê girîng e. Li gorî Hall, nasname di sirgûniyê de ne statîk an jî bingehîn e, lê bi tevgerê -li gorî derûdorên nû, dijwarî û derfetên nû- teşe digre. Kurdên li sirgûnê xwe di ciheke ku Hall jê re dibêje "cihên hîbrîd" de dibînin, ku li wir ezmûnên ji welatê wan û welatê wan ya nû ku lê bi cih bûne bi hev ve heliyan e. Ev hîbrîdî ne nîşana qelsiyê ye, lê çavkaniya afirînerî û nûjeniyê ye. Li vir formên nû yên nasnameya kurdî derketine holê û pêşketiye. Nasnameyên ku him li rabirduyê xwe dinêre ji bo ku hêz jê bigre û him jî li dahatuyê dinêre ji bo ku derbirînên nû avabike.

Her wiha sirgûnî ne tenê windakirinê lê di heman demê de derfetê jî temsîl dike. Di sirgûniyê de gelek kurd derfetên ji nû ve xwe naskirinê û zanebûneke domandina vê çandê ku her dem rastê destdirêjî û ji holê rakirine hatiye bidestxistiye. Ev pêvajoya fêrbûnê delîl û pêsîndkirina daxwaz û hewildanên berxwedanê, bîr û hizreke kol-

lektîf, vîyan û daxwazeke xurt ya jiyanê ye. Ne tenê ji hêla fîzîkî ve, lê ji hêla çandî û zimanî ve jî.

### **Cihê nefesgirtinê ji bo jin û ciwanan:**

Sirgûnî di gelek rewşan de bûye wekî cihekî nefesgirtinê ya pêwîst - ciheke ku mirov bi azadî dikare nefesê bigire, lêpirsinan li tiştên hatî damezrandî bike û bi afirandina rêbazên nû ve xwe di cîhanê de heyî bike. Ev bi taybetî ji bo komên ku di welatê xwe de dubare têne marjînalîzekirinê ye, wekî jin û ciwanên kurd. Di sirgûniyê de şêweyeke derfetê derdikeve holê - hem fîzîkî û hem jî derûnî - ku ew tiştên berê neazad bûn û nedikarî bihata goştin dikare bişêwe û bê gotin.

Ji bo gelek jinên kurd sirgûniyê deriyê derfetên nû vekiriye û bêdengiya xwe ya li hember avahiyên zordar yên bavixsalarî şikandiye. Li welêt li dijî normên malbatî an jî ya civakî rawestî dikare birisk be -an jî rastûrast negengaz be-. Lêbelê li diyasporayê, gelek jin bûn xweyî hêzeke ku hem xwe û hem jî cihê xwe yê li cîhanê ji nû ve pênase bikin. Li welatên wekî Almanya û Swêdê, tevheviyên

jinan ya weke KJAR Europe bi afirandina cihêke ewle ji bo jinên kurd re, kareke girîng kiriye. Ev cih û derfet ne tenê bûne wekî cihên hevdîtînê, lê di heman demê de bûne wekî navendên hişmendiya siyasî, birêxistinbûna femînîstî, fêrbûna ziman û jinûve avakirina çandê. Jinên li vir derfetên perwedê û xwendinên bilind bi destxistine, beşdarî huner, rojnamegerî û nîqaşên civakî bûne û bi awayekî çalak beşdarî tevgerên siyasî bûne – wekî mînak di hevgirtina bi Rojava re piştî 2014 an gelek jinên kurd yê li diyasporayê bi rêya xwepêşandan, kampanya û îfadeyên çandî bi awayekî seferberî xwe birêxistin.

Bi heman awayî sirgûnî ji bo ciwanên kurd jî bûye ciheke behnvedanê -nîşekî ku pir caran di navbera du (an jî zêdetir) çand û rastîyên civakî de asê maye. Gelek ciwan ji aliyek ve bi nasîn û tevîbûna civakagiştî û ji aliyê din ve jî bi daxwaz û hêviyên malbatê ve bi hişmendiyeke dualî ve xwe pêşxistiye. Sirgûnî ne tenê dûrbûna fizîkî ya ji welat daye wan, di heman demê de dûrbûnek hişmendîyê jî da-

ye wan ku ew bikaribin li ser têkoşînên dê û bavên xwe, li ser mîrat û trawmayan, û li ser nirx û aidiyetê xwe bifikirin. Ev nîş îfadeyên afirîner yê wekî *hip-hop*, *Spoken Word*, belgefilm, şano û tora civakî bikar tîne da ku bizelalî nasname, berxwe-dan û hêviyê xwe diyar bike. Ev cureyên îfadeyê him weke danasîna xwe û vegotinên nû yê li hember vegotinên ku hatine kirinê, ye - ew, rê li derfetên bîranînên kolektîf yê nû û formên nû yê civakî re vedikin.

Li Norwêcê, peyanerî yê weke KURD-film û CKV (*Kolektîfa Dengên Kurdî*) bûne platformên girîng ku li wir ciwan dikarin pirsên xwe yê li ser nasname, aidiyet û dadweriyê bikolin. Bi rêya hilberîna filman, karên *workshop* ku li wir hemûkes bi awayekî çalak bi hev re lêpirsinan dikin, bersivan dibînin û fêr dibin, û li cihên xwenîşandanan jî ji bo ku bikaribin xwe îfade bikin, dibin xweyî amûr û ziman, û di heman demê de derfetên ku piran di navbera nîşan de û di navbera paşeroj û niha de ava bikin, bi dest xistin e. Projeyên bi vî rengî ji ew dengên ku bi hêsanî dikarin werin

bêdengkirin û nedîtin re derfetên berbiçav bibin dide, û hesteke ku ciwan xweyî him li kurdûna xwe û him jî hebûna xwe ya li diyasporayê derkeve dide.

Bi vî rengî, sirgûnî ne tenê dibe cîhek ji bo domandina jiyane, lê di heman demê de dibe cîheke guhertinê -ku komên marjînalîzekirî dikarin nefes bigirin, kom û civaka xwe ava bikin û paşerojên nû bişeklînin.

### **Berxwedan û bîr**

Bîrûhizrên siyasî di ezmûnen sirgûnê de navendî ye, têkoşîneke ka kijan çîrok dê werin vegotin, kî/kê dê vebêje û çawa ev ê werin parastin. Di nebûna dewleteka kurdî û li hember bişaftineke bipergal, jibîrkirin û ji nû ve nivîsandina dîrokê de diyaspora dibe arşîvek zindî ya trawmayên kolektîf, bîranîn û hêviyan. Bûyerên wekî komkujiyên li Helebçeyê, zordariya sîstematîk ya li Bakur, şer û koçberkirina li Efrîn, û jenosîda li dijî êzîdiyan li Şengalê di hişmendîya kolektîf a kurdan de şopên kûr û girîng vekir. Ev ne tenê birînên ji rabirdûyê ne, lê

bîranînên nû û zindî ne, ku nasname û aidiyetê bişêwe dike.

Li diyasporayê, belgekirin, parastin û ragihandina van ezmûnan wekî erkek exlaqî û siyasî ye. Bi rêya çîrok, huner, muzîk, govend, wêje û çalakvanîyê ev dîrok dê bidome - ne wekî nostaljiyek pasîf, lê wekî seferberiyek çalak û berxwedanê. Bîr dibe amûrek, ne tenê ji bo şînê, lê ji bo afirîna çalakvanîyê. Ev redkirina jibîrkirinê ye, û israra hebûn û rûmetê li seranserê sînoran e.

Ji ber vê yekê sirgûnî xwedî potansiyeleke dualî ye: Ew hem cîheke bêhnvegirtinê ye – bêhngirtinek di hawîrdoreke ewle de – û hem ji nifşên pêşerojê re behndayîna jiyane ye. Ev cîheke hizirkirin, ji nû ve avakirin û fêrbûnê ye, lê di heman demê de cîhê tevger û çalavanî, hêvî û ji nû ve avakirinê ye jî. Di sirgûniyê de, şêweyekî hişmendîyeke kurd ya transneteweyî pêş dikeve, ku li wir bîr ne tenê mirovan bi rabirdûyê ve girêdide, lê di heman demê de rê li şêweyên nû yên civakî û fikir û ramenên dahatu vedike.

**Encam:**

Sirgûnî ji bo kurdên li dîyasporayê ji çîrokên windakirin û nebûnê zedetir e. Ew di heman demî de ciheke berxwedanek bi hêz, ji nû ve arastekirin û avakirina nasnameyê ye. Li hember zordariya dewletê, hilweşîna çandî û xeybanekirina dîrokî, sirgûniyê rê li formên nû yên civakî, parastina ziman, derbirîna hunerî û hişmendiya siyasî vekirîye. Li vir bi taybetî jin û ciwanên kurd ciheke nefesgirtinê ya nû bi dest xistine – ciheke ku ew dikarin bi azadî bifikirin, ji nû ve biafirînin û avahiyên damezrandî him ya li walêt him ji li ew welatê ku lê bicih bûne têxin bin pirs û tengasiyê.

Bi rêya înnîsiyatîfên dilxwaz, birêvebirina karên çandî û bîranînên kolektîf sirgûnî bûye qadeke fêrbûnê ku hem nîfşên kevin û hem jî yên nû derfet hene ku nasnameya kurd ji nû ve keşf bikin, li ser kar bikin û ji nû veavabikin. Siyaseta bîranînê -têkoşîna bibîranînê, vegotin û watedayîna rabirdûyê- di vê prosesê de roleke xwe yê navendî heye. Bîr ne tenê arşîveke li ser êşê ye, lê amûreke ji bo dahatuyê ye.

Bi vî awayî sirgûnî weke ciheke ku xweyî du hêzan e, derdikeve pêş. Ew mesafeyeke pêwîst ji bo nefesgirtinê ye, lê di heman demê de nêzîkatîyeke ku mirov bikaribe tevbigere ye jî. Ew hem birîn e û hem jî stratejiyek e, hem şikestinek e û hem jî pirek e.

Bi vî awayî sirgûnî wekî cihekî xwedî du hêzan derdikeve holê: Ew mesafeya pêwîst ji bo nefesgirtinê peyda dike, lê di heman demê de têra xwe nêzîk e ku meriv bikeve tevgerê. Ew hem birîn e û hem jî stratejiyek e, hem şikestinek e û hem jî pirek e. Di cihê sirgûniyê de, şeweyên nû yên aîdiyeta kurd têne afirandin - nerm, cihêreng û pêşeroj-navendî - ku şahidiya çandê zindî, di tevgerê berdeham de dikin. Bi vî awayî sirgûnî ne tenê cihekî ku mirov lê diqede, lê cihekî ku mirov li ser sînor û nîfşan şêkil dide - û ji hêla wan ve tê şekildan.

**KRONOLOJÎ:****DÎROKA SIRGÛNANIYA Kurd****1920–1946:****Hilweşîn, dagirkirin û bindestî**

- **1920:** Peymana Sevîrê, ku piştî şerê cîhanê ya yekem hat

- îmzekirin, rê li derfeta ku Kurdistaneke xweser ava bibe vekir. Ev yek di nav kurdan de hêviyek ji bo serxwebûna neteweyî afirand. Lêbelê ev peyman nehat pêkanîn, nemaze piştî dibertiya neteweperest a Tirkîyeyê ya bi serokatiya Mustafa Kemal Atatürk.
- **1923:** Peymana Lozanê şûna Sevrê digirê û doza neteweyî ya kurd bi tevahî paşguh dike. Kurdistan di navbera çar dewletan de tê dabeş kirin: Tirkîye, Îran, Iraq û Sûrîye. Kurd di dewletên neteweyî yên nû de dibin kêmnêweweyên bêmaf ku hebûna kurdan wekî gef dibînin.
  - **1925:** Serhildana Şêx Seîd.
  - **1929 – 1930:** Xoybun. Çend serhildanên kurd li dijî zordariya dewletê, nemaze li Tirkîyeyê. Serhildana herî navdar Serhildana Dêrsimê (1937–38) e, ku rastê hovîtiyek gelek tund û mezin tê: bi hezaran kes tî kuştin, jin û zarok tî sirgûnkirin û gelek dever tî valakirin. Ev yek dest bi serdemek dirêj a koçberiya navxweyî û bêdengiya kolektîf dike.
  - **1950–1970:** Destpêka Sirgûniyan, seferberiya rewşenbîrî û hişmendîya neteweyî
  - **1950–1960:** Xwendekar, akademîsyen û nivîskarên kurd dest bi serlêdanen penaberbûnê li Ewropayê, bi taybetî li Fransa, Brîtanya û Yekîtiya Sovyetê dikin. Yekem civakên sirgûniyê yên kurd li vir tîne damezrandin, ku wekî navendên ramana îdeolojîk û seferberiya neteweyî xizmet dikin.
  - **1961–1975:** Li Iraqê Mela Mistefa Barzanî ji bo xweserîya kurdan têkoşîneke çekdarî bi rê ve dibe. Ev nakokî dibe sedema krîzeke mirovî ya mezin: bi hezaran malbatên kurd bizorî sirgûnê Îran û welatên din ên cîran dibin. Sirgûnî karekterek mayîndetir digire.
  - Civakên sirgûniyê komeleyên xwendekarên kurd ava dikin, rojnameyên alternatîf di rewşên zehmet de derdixin û torên rewşenbîrî ava dikin ku ew ji bo seferberiyek herdem girîng bûn.
  - **1980–1999:** Koçberiya girseyî, tundûtûjî û rêxistina dîasporayê.

- **1980:** Darbeya leşkerî ya li Tirkîyê, ev dibe sedema çewi-sandineke berfireh a çalakvan û sempatîzanên kurd, nemaze yên ku bi PKKê ve girêdayî ne. Bi hezaran kes tîn girtin, îşkencekirin, an jî ji welêt derdikevin. Ewropa niha dibe penagehek girîng, û sirgûniya kurdan dibe ezmûneke girseyî.
- **1988:** Kampanyaya Enfalê ya Sedam Huseyîn li dijî kurdên li bakurê Iraqê bi komkujiya Helebçeyê digihîje lûtkeya xwe ya herî hovane, ku tê de zêdetirî 5 000 sivîl bi gaza jehrî tîne kuştin. Ev yek dibe sedema pêlek nû ya penaberan ber bi Îran, Tirkîye û paşê ber bi Ewropayê ve.
- **Salên 1990an:** Penaberên kurd bi hejmareke mezin li Almanya, Swêd, Hollanda û Keyaniya Yekbûyî bi cih dibin. Nifşekî cuda yê sirgûniyê derdikeve holê - ku ji çalakvanên siyasî, xebatkarên çandî û akademîsyenan pêk tê - ku li sirgûniyê sazî, komele û medyayê ava dikin.
- **2000–2011:** Dijîtalîzekirin, vejandina çandî û dengê dîyasporayê
- Bi pêşketina televîzyona satelîtê û internetê re, civakên sirgûnî amûrên nû bi dest dixin. Kanalên televîzyonê yên wekî Roj TV (ku ji Danîmarkayê tê weşandin) nûçe, ziman û çanda kurdî ji temaşevanek berfireh re pêşkeş kirin – hem li dîyasporayê û hem jî li welat.
- Kursên ziman, festîvalên muzîkê, navendên çandî û dibistanên şemiyê ji bo zarok û ciwanên li sirgûniyê, bi taybetî li Skandinavya û Almanyayê tene damezrandin. Ev yek dibe alîkar ku aîdiyeta zimanî û çandî di nav nifşan de were parastin.
- Civakên dîyasporayê xwe zêdetir ji hêla siyasî ve diyar dikin, beşdarî xebata mafên mirovan dibin û zextê li rayedarên Ewropî dikin da ku mafên kurdan nas bikin.

### **2011–2020: Şer, hevgyirtin û pêlek nû ya sirgûniyê**

- **2014:** Êrîşên DAIŞê li ser Şengal û Kobanî dibe sedema baleke globale û krîzeke nû ya penaberiyê. Êrîş herî zêde li ser kurdên êzîdî tîn kirin û gelek ji wan mafê penabertiyê li Ewropayê wergirtin.

- Şerê li dijî DAIŞê ji aliyê YPG û YPJ ve li Rojava hate bi rê ve birin. Ev berxwedana kurdan di qada navnetewî de weke berxwedaneke rewa hate nasîn. Gelek kes li dîyasporayê seferberiyek hevgirti hem bi rêya xwepêşandanê û hem jî bi piştgiriya humaniter ve çalak bûn.
- Jinên li sirgûnê da ku avahiyên baviksalar him di hawîrdora xwe de û him jî di civakên ku lê dijîn de tengav û bêzar bikin xwe bi îdealên femînîst ya Rojavayê bi rê xistin.
- Gelek ciwan ji bo fêrbûna Kurdî, xebata dilxwazî, an jî tevlibûna siyasetê diçin Kurdistanê. Ji bo hin kesan, ew rêwîtiyek şexsî ye, ji bo hin kesen di jî îfadeya çalakanîyê nû ya dîyasporayê ye.
- Sirgûnî hem birîn û hem jî stratejiyek e – ciheke biwenda-kirinê, lê di heman demê de bi afirînerî, berxwedanî û civakî ve tê nasîn. Li vir şeweyên nû yên hebûna Kurdan û bawerîya bi dahatuyê tê afirandin.

## 2020–heta niha:

### Guhertina nifşan, hişmendiya dîyasporayê û îfadeyên nû

- Nifşek nû ya kurdan ku li dîyasporayê mezin bûne,

BI BEXŞÎNÊ  
— TEVLÎ PÊŞEROJA ZAROKAN BIBIN —  
DONATIONER  
— VARA MED OCH BIDRA TILL BARNENS FRAMTID —




# Îskana malbateke Sêfkî ji Hüsni Mansur<sup>1</sup> ber bi Anatoliya navîn

Hanefi Celeblî

**N**ecip Şahin (1890 – 1984) di derheqê malbata Sêfkî – yek ji beşa eşîra Rişwan– û li ser jiyana xwe pirtûkokek (dora 26 rûpel) di sala 1978an de weşandiye.

Di vê pirtûkê de agahiyên bi nîrx hene di derheqê rêwîtiya malbata Sêfkî de;

- a- secerê serokên malbatê,
- b- îskana malbatê,
- c-aboriya malbatê,
- d- il û bergên malbatê,
- e- çekên parastinê,
- e-şûnê mayînê/hewîne.

## **Secerê Serokên Malbatê**

Bavê yekem Kawas axa ye, di sala 1765an de serî xwe datîne. Kurê

wî Nûrî, şûna bavê xwe digre û cinazê bavê xwe li goristana Avcılar ya bajarokê Gövdeliyê, girêdayî bajarê Xerpûtê (Elazig) vedişêre.

Nûrî axa, cara duemîn bi jinekê ku pir jê hez dike re dizewice. Ev jin, ji malbata Zîrafikî ye, beşek ji eşîra Beraziya ye ku li dora Hüsni Mansur dijîn.

Nûrî axa mirovekî egît e, siwarekî jîr e. Herweha mêvanperwerekî bi nav û deng e. Di dema xwe de sînîkeka sufrê ji sifir kiriye, li ser sîniye navê Mehmet Suryanî û tarîxa rûmî 1155 (1737) hatiye nivîsandin. Ev sînî îro li mala Hecî Îbrahîm Şahîn (li gundê Celepê hc) tê muhafaza kirin.

---

<sup>1</sup> Berî 1926:an navê Adiyamanê Hüsni Mansur bû, (Birca Mansur hc). Ev nav ji xelîfê Al Mansur -ku li Baxdadê di hindurî salên 754 - 775- hatiye girtin.



Ev berga jiyana giştî  
û taybet ya bapîrên  
eşîra sefîkan, ku  
ji konfederasyona  
reşşyan in û dîroka  
bûyerên wan ji alîyê  
rehmetiyê Necip  
Şahîn ve bi tirkî  
wek bîranîn hatîye  
nivisîn.

Piştî ku Nûrî axa di sala 1797an de serî xwe datîne, kurê wî Ehmed axa şûna bavê xwe digre. Ehmed axa jî bavê xwe li goristana Avcılar vedişêre.

Ehmed axa jî wek bavê xwe malbatê bi rengekî baş îdare dike, ola malbatê li ser bingehê baş datîne û bi xanedaniya xwe nav û deng daye.

Ehmed axa di sala 1824an de serî xwe datîne. Şûna Ehmed axa, kurê wî Sari îsmail (Simê mezin hc) digrê. Sari Îsmail jî bavê xwe li goristana Avcılar vedişêre.

Ev hersê bav, li kêlêka hevdu hatine veşartin. Ji bo ku gorên wan bi rehetî were naskirin, li ber serî û lingên wan kevirên bilind hatine danîn.

Piştî ku Sari Îsmail serokatîyê malbatê digre destê xwe, rêveberiya nifûsekî qasî 1700 kesî dike. Havînan li dora Uzun Yayla, zivistanan jî li deşta Haymanayê geriyane. Tê zanîn ku li Haymanayê, li gundê Çaliş zivistanan debas kirine.

Sê kurên Sari Îsmail hebûn; Molla Îbrahîm (Milîbram hc), Hecî Huseyîn, Hecî Osman.

Di sala 1851ê de Sari îsmail serî xwe datîne. Kurê wî Molla îbrahîm îdara malbatê digrê destê xwe. Molla îbrahîm cinazê bavê xwe li nehîya Kamanê – girêdayî Kirşehîrê– vedişêre.

Çar kurên Molla Îbrahîm hebûn; Îsmailê duwem (Simê biçûk hc) Molla Hasan, Hecî û Omer. Navê diya Molla Îbrahîm, Hatîce bû.

Molla Îbrahîm li Çingirli-zozaneke bajarokê Kuluyê kaniyekê- ku ava wê kaniyê îro jî diherike- ava kiriye. Herweha kaniya li gundê Celepê, cara pêşin di sala 1856an de bi destê Mustafa Ustayê ji Madanê hatiye ava kirin.

Molla îbrahîm xwediyê serweteke mezin bû. Ji ber ku li wê demê sandûq tunebûn, wî hebûna xwe ya neqît di tûrikên ku ji çerm dihate dirûn, vedişart.

Molla Îbrahîm li malbata xwe zext nedikir, hemû pirsên di nava malbatê de bi gotin çareser dikir.

Nav û dengê Molla Îbrahîm bi comerdî û wêrekî belav bûbû. Keç û xortên ku dilketiyê hev bûn – lê dê û bavê wan li dij derdiketin– destê hev digirtin û xwe davêtin bextê Molla Îbrahîm. Di jiyana xwe de Molla

Îbrahîm razîbûna sîhûsisê dê û bavan digre û sîhûsisê hêlin bi dawatan tên ava kirin.

Gava Molla Îbrahîm nexweş dikeve, dixweza ku nivînên wî di bin kona ku wî hertim wextê xwe di binî de derbas dikir, çêkin. Piştî çend rojan di binî wê konê de, li Çingirliyê di sala 1870î de serî xwe datîne.

Cinazê Molla Îbrahîm ji aliyê kurê wî yê mezin Îsmail (Simê biçûk hc) û kurê din Molla Hasan, li goristana ku li rojhilatê Kuluyê ye, tê veşartin. Molla Hasan şûna bavê xwe digre.

Zarokên Molla îbrahîm; Îsmail, Molla Hasan, Hacî û Omer milkê ku ji bavê wan dimîne, di nav xwe de parve dikin. Molla Hasan zilamekî zana û oldar bû. Lewma wî nexwestiyê ji mîrata bavê xwe parê xwe bigre, tenê pirtûkên ku wî xwendiyê digre û parê xwe ji birayên din re dihêle û destvala ji mal derdikeve.

Di dema xortaniya Necîp Şahîn de nekokiyek di navbera nebiyên Molla Hasan û Îsmail (Simê biçûk) rû dide. Lewra nivîskar, secerê Îsmail dihêle û bi secerê Molla Hasan berdewam dike. Necîp Şahîn herweha gundê

Celepê di sala 1929an de terk dike û diçe gundê Böğürdelik (Tetera), – girêdayî Cihanbeylî ye– cîwar dibe û jiyana xwe li wir berdewam dike.

Li vir divê ez rastiyekî destnîşan bikim. Nivîskar dibêje ku Molla Hasan şûna bavê xwe digrê. Lê di eynê wextê de dibêje Molla Hasan li gel pirtûkên xwe ji mal destvala derdikeve. Bêgoman li vir nakokiyek heye. Tê zanîn ku Îsmâil (Simê biçuk hc) şûna bavê xwe, Molla Îbrahîm (Milîbram) serokatiya malbatê digrê destê xwe. Cîhe ku îro Celep e, di destpêkê de bi navê Îsmâil, wek ”gundê Simê” tê bi navkirin. Îro jî salmezînen li deverê ji bo Celepê, ”gundê Simê” bi kar tînin.

### **Îskana Malbatê**

Dema ku Molla Îbrahîm tev malbata xwe li dora Kamanê digeriya, hukumatê ew dawetî îskanê kirine. Beşek ji malbatê li dijî fermana hukumatê derketine, lê Molla Îbrahîm fermana hukumatê bi cî aniyê û malbata xwe – ku ji du hezar kesî pêk dihat– li cîhe ku îro Beşkardeş e, îskan dike û li wir kaniyekê ava dike, ava wê kaniyê îro jî diherike.

Molla Îbrahîm dîsa havînan li Uzun Yayla û cîhên din digere. Li gundê Kara Fakıllı (îro Yeni Fakıllı hc) girêdayî qezaya Boğazlıyan mizgeftêkê xêra diya xwe Hatîce xanê ava dike. Li ser keviyekî mermer li ser deriyê mizgeftê ev nivîs hatiye nivîsandin:

*Sahibul hayrat ve hasanat  
Rişvan aşiretinden Sarı İsmail  
oğullarından Hatice oğlu  
Molla İbrahîm tarafından inşa  
edilmiştir.*

*(Ji aliyê Molla Îbrahîm,  
xwediyê hayrat û hasanat kurê  
Hatîce, ji zarokên Sari İsmâil  
ji eşîra Rişwan ve hatiye ava  
kirin.)*

Cara duwem hukumatê bi fermaneke giran malbatê mecbûrî îskanê dike. Li ser fermana hukumatê Molla Îbrahîm dest ji koçeriyê berdide û beşek ji malbatê li cîhê ku îro Gördoğlu ye (Gundê Omê hc) îskan dike. Beşek din ji malbatê li cîhê ku îro Celep e (Gundê Simê/Sêvka hc), di sala 1839an de îskan dike. Di bin serokatiya Hacî Osman, ji mala Bükü jî beşek din li cîhê

ku îro gundê Bulduk e, di sala 1854an de îskan dike. Beşa dawî ji aliyê kurê Herdem, Bekir û Berkal ji gunde Kosê -îro girêdayî Haymanayê ye- bi navê Kerpîç (gundê Kosê hc) hatiyê îskan kirin. Bi vî awayî malbata ku ji du hezar kesî pêk hatibû bi zora hukumeta Osmanî li çar gundan îskan bûne.

Demekî ji her gundekî nune-rek tê hilbijartin û bi wan re li ser peşniyarên wan, giliyên wan giftûgo tê kirin. Bi vî rengê îdara van gundan di çerçoveke edetî û dadî tê meşandin.

### **Aboriya malbatê**

Aboriya malbatê bi şivantî û karê hêştiran dibû. Xwarinên wan bi giştî ji sawar, rûnê kêw, şîr, mast û ji goşt pêk dihat.

### **Cil û bergên malbatê**

Cilûbergên wan hêsan û besît bûn, ji şalên bi doxîn, camedan – bi navekî din salta– ji bo jin û mêran, ji bo jinan fistan û xef-tan pêk dihat.

### **Alavên parastinê**

Alavên parastinê yê Malbatê ji van çekan pêk dihat: Sîwaran rim, tîr û şûr bi kar tanîn û çekên di dest peyayan şûr, mertal û ço (şiv) bûn.

### **Şûnê mayînê/hewînê**

Havînan li deverên ku pezê xwe diçêrandin, di bin konên ku ji filîkê hatibûn hûnandin de diman, lê zivistanan li nevalekê kortek bi qasî yek– du metro kûr dikolan û serî kortê bi kona ji filîkê digirtin. Di van kortan de diman û malê xwe diparstin.

Divê li vir ez sipasî û rêzên xwe ji bo apê Necîp pêşkêş bikim. Ji vê pirtûkokê bi agahiyên bi nirx, em, cîlên (neslên) nû ji boriya xwe agadar dibin. Eger em, yên ku destê wan pênuş digrê, bîranînên xwe, serpehatiyên xwe binivîsin û ji cîlên nû re bihêlin, ev ê bibe dîroka me, em ê bibin xwediyê arşivekî dewlemend. Neteweyên bê arşiv wê winda bibin, namînin.



# KILAMÊN ME (XVII)

Mem Xelîkan

## Eskero Yaro

**K**ilameke Kurdên Anatolia navîn e. Kilameke şîna yê gelerî ye. Dema min ji bo vê kilamê lêkolîn kir mîna kilama *Şivên*, ji kê pirsîm digot kilama gundê me ye. Kilama kîjan gundî ye min serast nekir. Ji bo wê jî min gelerî nîvisand. Kilamê kê straye, li ser kê hatiye stran jî min tiştek bi dest nexist. Lê li gor gotinan, xanim/ hevjinê wî eskerî/leşkerî li ser mêtê xwe straye.

Mêtê wê jina şare li Vanê esker e. Sal 1950– 55 in. (min ew dîrok ji gotinên çavkanîyan bi-

derxist. (Ew, ji filan gundî hevalê filan kesî yê eskerê bû). Ew eskerê, li Vanê nexwaş dikeve. Dikin e nexwaşxanê. Dema rewşa wî ya tenduristiyê giran û xirab dibe, fermandarê wî namekê ji malbata wî re dişîne. Ji bo ku werin seredanê û wî bibin mal.

Ji malbata esker çend meri û hevjinê wî terin Vanê. Li wir, xebera reş didin wana. Esker, ji ber nexwaşiyê dina xwe guherîye û çûye ser dilovanîya xwe. Xani-ma esker wê xebera reş dibîxîze dest bi kilama dike.

Eskerî min eskerê Vanê

Erebe kirê kir çûm xestexanê  
Min go nexwaşekî min î li vir bû, kanî  
Gotin tabûrci kirin rapor danê  
Yaro yar o eskero yar o



Piştâ xwe mede çiyayê Ercîsê axa sar o  
Lawo lawo eskero lawo  
Dakê xwe qurbane eskera gîya wo  
Dubare/ Neqeret

Yuzbaşî ye li ser we fite fit e  
Esker neman kişand kir şîrit e  
Yara qurban li canê te eyam be  
Eywax eywax mala yara te yê bi kîlît e  
Dubare

Were eskerê minî sê me ye barê  
Lo lo çima tu nizanî halê birîndarê  
Çavê yara te birijin  
Hundir li yara te hate xarê  
Dubare

Çiyayê Ercîsê bişewite mij dûman e  
Hêstirkê çave min nasekinin bûn baran e  
Toxtorê mezin li ser gêştin hev  
Eywax eywax va çi eskerî bê derman e  
Dubare

Yaro qurban me maleke xwe neqîşand  
Me benekî dirêj sera kişand  
Şabûna dilê xwe re têda rûniştinî  
Felekê hat ser me de hilweşand.

Çavkanî: Serbulend Kanat

Gotûbêjek bi Hacî Akman re: Uskê Cimik

## Seferberkirina bîra kurdî

*“Bîra kurdî divê bê seferberkiri”*

*Ev tê çi wateyê?*

**Hacî Akman:** Seferberkirina bîra kurdî gotin ku bîr ne tenê bi awayekî pasîf were parastin, lê were çalak kirin, xebitandin, û bibe hêzeke ajotinê. Bîra me dikeve ser destnîşankirina qir-kirin, koçberiyên bi darê zorê, qirêjkirina ziman û nasnameya siyasî. Bîr bi şikl û stratejiyek rast dikare bibe çavkaniyek bo daxwaza maf û xwediyê nasnamekî xwecihî. Bîra Kurdî gava tê xebitandin, di navbera windabûna dîrin û xewna pêserojê de dibe pêvajoya raman û kar.

*Kesekî kurd çawa dikare bîra xwe biparêze û bi awayekî çalak bi kar bîne?*

**Hacî Akman:** Bîra kesayî dikare were parastin bi bîranîna dîroka malbatê, koçberiyê, ziman û xebatên zarokan. Zimanê kurdî bi kar bînin, hunerê xwe nîşan bidin, navê gund û gundiyan ne ji bîr nekin. Kes dikare bi stran, fîlm, nivîsandin, şopandin û dijî-



talkirin bîra xwe biparêze. Dîroka xwe şîret bikin û bibêjin: ez li vir im, ez bûm, ez mam.

*Civakek kurd çi gavên rast divê bide destpêkirin da ku bîra xwe biparêze û bi serkeftî bikar bîne?*

**Hacî Akman:** Bîra civakî dikare were xurt kirin dema ku perwerdehiya dîrokî, arşivkirin, ziman û huner di nav civata xwe de cih digire.

Divê em rêveberiyek rast saz bikin, ji bo ku bîr bibe bingehê ya

hevkarîya neteweyî. Gava ku bîr tê civakî kirin, ew qediya qirînê dide ber çav û nasnameya koman vedike.

Her gundek, her malek, her kovarek dikare bibe nexşe ji bo bîrê zindî.

*Rêxistinên kurdan (akademî, navendên çandê, medya, û saziyên neteweyî) çawa dikarin di vê pêvajoya seferberkirinê de rolê xwe bilîzin?*

**Hacî Akman:** Rêxistin dikarin be rêka arşîvkirinê, belavkirina zanîn û şîretandina dîroka komî û koçberiyê. Akademî û navendên çandê dikarin çavkaniyekên perwerdehî û fêmîkirinê çêbikin. Pêdivî ye ku bîra xwe bi şêwaza stratejîk, planî û koordîne were pêşxistin. Bîr, dema ku li nav rêveberiyek neteweyî û zanistî tê, dibe xewna azadîyê.

*Herêma Kurdistanê û hikûmetên wê çî projeyan dikarin pêşkêş bikin da ku bîra xwe biparêzin û bi bandor bikaranînin?*

**Hacî Akman:** Projeyên muzexane, memorial, arşîvê jenosîd, kampanyayên li ser Helebçe, arşîva dengbêjî, navendên zanîngehî hemû dikarin xebatê bîrê bibin.

Bîra me divê were bi rêxistin û şêwaza fermî bi aramiya siyasî pêşxistin. Hêz û îmkaniyên çandî hene, lê ew hevî heye ku rêveberîya siyasî wisa jî jê beşdar be.

*Ji bo parastin û belavkirina bîra Kurdî, çî amûr, rêbaz, û teknolojiê dikarin bêne bikaranînin?*

**Hacî Akman:** Dijîtalkirin, arşîvê vîdyoyî, stran, film, belgekirina deng û gotar, GIS û metadata – hemû amûrên nûjen ne.

Teknolojî dikare bibe dostê bîranînê, eger ew were bi şêwaza zanistî û rastanî xebitandin. Çand û huner, gava ku bi teknolocî ve girêdayî dibin, dikarin bîrê fêmîbûnê bihez bikin.

*Gelên din ên cîhanê yên ku bîra xwe bi serkeftî seferber kirine, hene? Em kurd çî fêrî wan dibin?*

**Hacî Akman:** Ji ermenîyan, cihûyan, û Amerîkayê Latîn em dikarin fêr bibin: huner bi ser trauma, arşîvê dijîtal, memorial û belgekirina devkî. Ev gel parastina bîrê bi huner, zanîn û nasname kirine. Em jî dikarin şopên xwe bidin. Hunermend, nivîskar û filmmaker, dikare nasname bi huner bipeyivin.

*Di parastina bîra kurdî de, çi çewtîyên sereke di bernameyên berê de hatin dîtin?*

**Hacî Akman:** Bernameyên berê bi hêza siyasî re girêdayî tunebûn. Dewlet û rêveberî li vir bîne girêdan û koordînasyon.

Bê nasnameya fermî, çalakiyên parastinê dijwar in. Pêdivîye ku ew bi destnîşankirin û şiklê fermî were avakirin. Nabe bîr bimîne tenê berhevokek, divê ew bibe rêberê çalakiyê û şîretinê.

*Di navbera bîra êşan û avakirina pêşerojê de, çawa dikare terazûyek hevpar were çêkirin?*

**Hacî Akman:** Bîra êşê divê were naskirin, ne sûcdarkirin, lê jî bibe sedema axaftin û lihevhatinê.

Bîr ne tenê sedemê êşê ye – ew dikare bibe şîfa, pêvajoya dad û fêmîbûnê. Hunermend û nivîskar dikarin bîrê bi nav xebatên şîfa bixin nav çand û civakê.

*Ji bo seferberkirina bîra kurdî, çi projeyan, kampanyayan û rêveberî divê bêne pêkanîn?*

**Hacî Akman:** Belgekirina dîroka devkî, arşivkirin, projeya çandî, û şîretandina ciwan – hemû çavkaniyên bingehîn in.

Zarok û ciwan divên bi çîrokan, dengbêjiyan, wêne û muzîkê re bi bîrê xwe ve girêdayî bibin. Bîrê xwe em nikarin binivîsin bê gotin û bêtir: em divê bibêjin û nîşan bidin.

*Kurdên Anatoliya Navîn (bi kêmanî yek milyon kes) çi dikarin bikin da ku bîra xwe biparêzin û bi domdarî bidomînin?*

**Hacî Akman:** Kurdên Anatoliyê hatine paşçavgirtin û asîmîlekirin. Lê dîsa hêz hene da ku bîrê xwe biparêzin. Belgekirina dîroka herêmî, çîroka malbat, kursên ziman, nivîsîn, huner, şevên çandî – hemî tişt in ku dikare bîrê zindî bikin.

Rêxistin, hevkarîya akademî, û komelên malperî pêdivî ye – em hewce ne ku xwe bi xwe nas bikin.

*Di diasporaya Ewropayê de, Kurdên Anatoliya Navîn çawa dikarin bi rêxistin û stratejîyêkî rast bîra xwe û nasnameya xwe biparêzin?*

**Hacî Akman:** Parastina bîrê di diasporayê de pêdivî bi berxwedanê çandî, zimanî û xebatekî stratejîk heye. Komel, navend, kovar û film in. Rêbazên wê bêne bikaranîn. Rêxistina ko-

melên xwecihî dikare çalakiyê zindî bike.

Her zarokek kurd, gava zara-vê xwe dizane û hunera xwe dibîne, nasnameya xwe dikeve gundê xwe yê hêvî.

*Hûn çi xebat dibînin ku herêma*

*Başûrê Kurdistanê îro li ser parastina bîra xwe dike?*

**Hacî Akman:** Başûrê Kurdistanê parastina mîrata xwe ya dîrokî dikare bi hêzên çandî û siyasî pêş bixe. Projeyên muzexane, memorial, arşîva jenosîd, kampanyayên li ser Helebçe, arşîva dengbêjî, navendên zanîngehî – ev hemî destpêkan in.

Em hêvîdar in ku ew xebat bi şiklê fermî, bi daxuyaniya siyasî û bi nasnameya yêkeser were pêşxistin.

*Ji bo vê herêmê, hûn çi pêdivî û*

*kêmasî dibînin ku divê bêne bertewan kirin?*

**Hacî Akman:** Başûr hêz û îmkanîyên çandî hene, lê hejmarên siyasî, dadmendî û komelî hêj zêde ne. Yekîtiya siyasî were bihêzkerin, saziyên demokratîk pêş bixin, dîrok û muzexaneyên mîratê bi rêz were avakirin.

Azadiya ragihandinê û mafên jinan jî divê bibin parzûnên xurt a bîrê neteweyî.

*Kovara Bîrnebûnê, ku di nav kurdên Anatoliya Navîn de ji bo parastina bîra kurdî dixebite, xebatekî girîng kiriye. Li gorî we, çi gavên zêde dikarin bêne hilgirtin da ku bîrê kurdî bi bandortir bêne bikaranîn?*

**Hacî Akman:** Bîrnebûn xebateke girîng kiriye da ku bîra kurdî ya Anatoliya Navîn were parastin.

Arşîvê dijîtal ava bike, projeyên dîroka devkî (ji pîran, çîrokan, vîdyoyan), di nav xwe de komên hunerî û zimanî saz bike.

Berhem û malperan çêbike, ku bîr were belav kirin. Ev hemî, bîrê ji rûniştinê derdixe vegotinê.

*Di dawiyê de, hûn dikarin ji*

*ciwanên kurd re peyamek bidin?*

**Hacî Akman:** Hûn kapitalê herî girîng in ji bo Kurdistanê. Ji xewnên mezin netirsin.

Li ser xwe bixebitin, perwerde û zanîne bijêrin. Xwedî çand, dîrok û nîrxên xwe bin, bi hev re şer bikin ji bo pêşerojek baştir.

Hafizeya xwe biparêzin, çimkî ew mifta ye ku deriyên vedike.

# BERDÊLÎ

Hızır Akbina

**B**erdêlî binatiyê xwe ji zimanê kurd têye. Ji ber hev va dayîn. Îro pir tinne. Lê dema berê hebû. Yên xizan ji ber qelingê giran qîz û lawên xwe bi hevûdûra dizevicandin. Yek jî landik kêrt kirin hebû. Jinên bi ducana ji bo dergûşên xwe şor didana hev. Yan jî dergûş hatine dine bi şiva landika wan kêrt dikirin. Min li ser berdêlîyê ji we re bi Çûçan û Şêhrîbanê re deng û pirs kir û ez ê hekata wan binivînim.

H- Dayika Çûçan berdêlîya we çing bû?

Çûçan- Yawrum heqat weng bû. Rojekê bavê min ji terlê dihatîye. Li ser rêya wî kaniyek hebûye. Hatiye ku Axe li ser kaniyê rûniştiye. Bavê min silav dayê. Axe bave min ditiye û pir şabûye. Li hev pirsîne. Axe şoraniye ser zewaca kurikan. Gotiye, “Selo malbata we malbateka

baş e, tu jî Hecan jî însanên rindin. Ez dixwezim bi we ra xisim bim. Tu qîza xwe Çûçanê bide lawê min Haso, ez jî keçika xwe Şêhrîbanê bi lawê te Êso dim.” Bavê min gotiye, “Xwedê kiriye qeder çima nabe. Em ê hene ji we rindtir bibinin!”

H- Bavê te xebera zawacê çing da we?

Çûçan- Bavê min ji cot hat. Min mêzekir bavê min pir bi kelecane. Bange dayika min kir, bir çardaxê. Min guh da ser ku dibêje were ez xebereka rind bi te dim. Axe dibê ku;

– Em Çûçanê bi Şêhrîbanê va bikin berdêl. Tu çi dibêjî?

– Ez bême çi Êso! Em ji keçik û lawê xwe bipirsîn ka razine an na!

Min di hundirê malê de xeber bihîst, mîna aveka kelî li ser mi de kirin. Dayika min çexa min bû;

– Te gotinên me bihîstin?

– Erê dayê min bihîst! got bi hêrsekî. Ez çûm ketime hoda xwe. Hêstirkên min bûnê baran...

Bû êvar, jina Axe bi Şêhrîbanê va hatin, rûniştin. Şor anîn ser zewaca me, got;

– Yawrim, vî qismetî xwe red meke, were lawê min bike.

Min tu şor nekirin. Jina Axe fahmkir ku dilê min tûneye. Çexedayika min bû û got;

– Gulê, nekir ma neke. Ji lawê min re jin tûnene!

Jina Axe bi Şêhrîbanê va çûn şiva min ji dayika xwe ra got;

– Ve dine de ez bi Êso va biminim, ez dîsa jî nakim.

Ji du rojan şinda ji me re xeber hat kû yen Şêhrîbanê bi gundê jêridine. Birayê min hat xwe avite hundirî malê û got;

– Xangê tu dizanî, yê Şêhrîbanê bi gundên jêridine, Şêhrîban dan ez ê xwe bikujim. Tu were bê erê. Wa qedara me hurdiya jî. Heso ne xortekî xerabe. Min je ra got;

Nalê hana nalek tenge  
Gur an têda lange lange  
Lo birango dilê te çinge  
Dilê min jî dilekî wenge

Birayê min got;

– Xangê tu dibeyî çî? Te dilkî xwe girt yoxse? Bêje hele ve kîye? Min got;

– Ez ji Azad hezdkim.

Min got û ji hundir derketim û çûm ketim nav nivîne xwe. Heta sibê girîyam. Ez sibe rabûm. Bavê min got:

– Me biryara xwe dayiye, Me tu dayî Haso!

Ez wê çare mam. Ji Azad re xeber şand. Min got, “min birevine.” Azad bi hevala min a nêz Mêrem ê re xeber şand, gotiye; “ez dergîsta lawê xaltîya xwe narevînim. Tu dine– axiret xanga min î êdin.” Min va şoran bihistin bi şûn de bîrva çûme. Êdi tû çarê min neman. Me serê xwe dîna. Axe çû rela me hurdîyan jî kir. Kutîye gewende bi Aço va girtin. Sê rojan, sê şevan dol û zirne lêxistin. Dawîye dolê em kirin bûk, danîn ber yek malan.

H– Dayike Şêhrîbanê tu boyî berdêlîye dibeyî çî?

Şêhrîban– Yawrim min dît, ma dijminên min nabînin. Çar însanê di bin bandorêdane. Tişteki li male gorimê min dibû xasiye min digot;

– Me ya waneyê kiriye nav pembo û herîr, ev ê yê me dişinîne karên giran.

Hetakû em bi kurik kuflet bûnî me çile kişandin. Ji we şinda xasi ji hukmê xwe neman, edi em ferah bûnî.

Çûçan– Ji salnivekê bi şinda Heso motor wergerand û di bin da ma, mir. Ez li mala xezûrê xwe rûniştim. Jî penç ma şinda jî jina Azad, Mêrem ji serber tev çû mir. Min xebere ve bihîst Mêrem hevala min a delal bû canecan bû, ez pir pê şewitîm. Di dilê min da çûyîna şina Mêremê hebû ema min nexast rûyê xwe bî rûyê Azad xim. Cîraneka me hat, got;

– Keçê tu çawa digirî? Rabe em herin mala Mêremê.

Ez rabûm çûm di gûnd me da kesek nemeye gîştik berginde min hatin. Min jê ra şînek kir. Gundîya ji dilê xwe da ez dayi-

me Azad. Ji çend ro şiva ji min ra gotin, “emê te bidin Azad.” Min got; “qet nabe, Azad jina lawê xaltîya xwe nabe. Çend ma bi şunda bavê min got;

– Yawrim tu bê mêr di wê malê da nabî. Ez ê te bidime gundê jêrî ye qelaw, here ser nasîbekî xwe. Min got;

– Tu dizanî Bavo!

Gundî hatin dest ningên bavê min, gotin; “em ê wê bidinî Azad.” Min siftê qebûl nekiri bû lê, min mêzekir ku kesê min bidênê ji bavê min mezintire. Bavê min ji boyî qêling razî bûye. Gundîya gotin; “ew heqê Azad e, em ê wê bi Azad din.” Bavê min got; “ez, wê bê qeling nadim.” Wê wextê ez mêranîya axê me ji bîr nakim got;

– Azad jî lawê min e, ez ê mesrefên wî gîştikan bidim.

Du jin hatin, ketin pîyê min, ez birim mala Azad...

# HÊVÎÇIRA

Rojvan Enes

Ewqas şikestime ku  
Nikarim ji hebûna te bawer bikim  
Parîyên dilê xwe digihînim hev  
Li noqa tenêtîyê  
Û te tînim bîra xwe  
Ku bedewîyê û hezkirinê ji bîr nekim

Ditirsim helbesta te nîşanî te bidim  
Tu nizanî çendan ji ber qîmetdayînê ez terkandim  
Tu hêjayî qîmeta herî bilind î  
Bêhnfirehîya min î  
Lê çî bikim ditirsim ku  
Tu jî ji min sar bibî

Dilê min diqete ji xeyala te  
Bi çar gavî jê direvim  
Xişxişkê sar xwe li min digirin  
Naxwazim hembêza te kevim  
Naxwazim te ramûsim  
Xeyalên min heta îro her têkçûyîne

Çî xeyal ketibe serê min, çend xeyal  
Direvim ji xeyala te bi çar gavî  
Bo bi rastî bikarim lêvên te yên dilhêlîn ramûsim  
Şera min a bi xeyalan î

# MALBAT

Kübra Uludağ

Xatirxwestinek din li ser milê min ket  
Hêstirek di dilê min de veşartî bû  
Destên diya min  
Çavên bêdeng ên bavê min  
Zarokatiya min di nav dîwarên mala min de veşartî bû...  
Her ku ez hewl didim ji vî derî derkevim, ev dinya girantir dibe...  
Lê ez dizanim...  
Duayên te her tim li pişt min in mîna siya min.  
Ez diçim, erê, lê tu her tim bi min re yî.  
Di dilê min de malek heye.

## AGAHDARYEKE GIRÎNG

Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurdên Anatoliya Navîn wêneyekî kevn di Bîrnebûnê de biweşînin. Bi vî awayî em ê hem bi tevgirêdana kurdên Anatoliya Navîn bizanin, hem jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çi awayî ne.

Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatoliyê didin zanîn ku: wêneyên kesên ji malbatê (jin–mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmanciyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopiyekê bi rê bikin. Bi vê yekê em ê bi dewlenediya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr bînin. Herwiha serpehatî, çîrok, metelok û kilamên ji aliyê we hebin ji kovarê re bişînin.

Redaksiyon

# Çiyayê Sîpanê

Uskê Cimik

Çi hewûye çî tune wûye li gundekî kerek hewû ye.

Rokê xudanê kerê gotiye:

– Kero, tu yî êdî kal bûyî. Ti taqet di te nemaye. Tu şanakî (nikarî) barê giran li piştê xwe bikî. Ez mêrikî xizan im. Ez şanakim te xwedî bikim.

Û wî ker ji malê derxistiye. Ker ketiyê rê û serê xwe heynaye çûye.

Kerê gotiye:

– Ezê herim çiyayê Sîpanê. Li wir heye pelçikên panê.

Hendik çûye pir çûye. Li ser rê rastê kûçikekî hatiye. Ji kûçik pirs kiriye:

– Birayê kûçik, çir bû, va çî halê te ye? Çima tu digirî?

Kûçik gotiye:

– Rokê xudanê min got, tu êdî kal bûyî, ti taqet di te da nemaye. Tu êdî şanakî pêz ji guran biparizî. Paşê wî di boçê min ra

girt, ez avêtim derva. Ez ketim rê, lê ez kuda herim?

Kerê gotiye:

– Were em herin çiyayê Sîpanê. Li wir bixwin pelçikên panê.

Ker û kûçik her du heval ketinê rê çûne. Hendik çûne pir çûne, di rê da raste pisikekê hatine. Kerê ji pisikê pirs kiriye:

– Pisika delalîkê, çir bû, va çî halê te ye? Çima tu digirî?

Pisikê gotiye:

– Rokê xudanê min got, tu êdî pîr bûyî, ti taqet di te da nemaye. Tu êdî şanakî malê ji mişkan biparizî. Paşê wî di boçê min ra girt, ez avêtim derva. Ez ketim rê, lê ez kuda herim?

Kerê gotiye:

– Were em herin çiyayê Sîpanê. Li wir bixwin pelçikên panê.

Ker, kûçik û pisik her sê heval ketinê rê çûne. Hendik çûne

pir çûne, di rê da raste xorizekî (dîkekî) hatine. Kerê ji xorizê pirs kiriye:

– Birayê xoriz, çir bû, va çi halê te ye? Çima tu digirî?

Xorizê gotiye:

– Rokê xudanê min got, tu êdî kal bûyî, ti taqet di te da nemaye. Deng ji te dernakeve ye. Tu êdî her siwê şanakî bikî qîrê qîr. Paşê wî di qenetê min ra girt, ez avêtim derva. Ez ketim rê, lê ez kuda herim?

Kerê gotiye:

– Were em herin çiyayê Sîpanê.

Li wir bixwin pelçikên panê.

Ker, kûçik, pisik û xoriz her çar heval ketinê rê çûne. Çend ro, çend meh çûne kesî nizanê lê, ewana gehîştine çiyayê Sîpanê. Her der hêşinî bûye, her der ava goza bûye, her der çêre û daristan bûye. Xwarine û vexwarine, ji kefa kilam gotine û bazdane.



# EMBAZÊ MI KAMIL SÜMBÛL

Şukru DERÎN

Însanî ke dinya xo bedilnenî, bi “rehmetî” zî name benî. Mana de, çekuya “merg”î zaf giran a. Qey aye ra ma insanî herinda çekuya “merg” î de ge-ge sewbîna çekuyan xebitnenî.

Eleqeyê nêweşî û mergî bi yewbînan est o. Însanan tedawiyê zaf- zaf nêweşîyan rê yew çare dîyo. Labelê hema zî nêweşî est ê ke tedawiyê xo çîn o; yê Kamîlî yew nêweşîya xo ya winasî est bî.

Kamîl qezaya Çêrmûge ra yo. Mi o Anqara de serra 1976î de şinasna. Kamîl Anqara de hem wendekarê ûnîversîte û hem zî karker bi. O wext, zafaneyê wendekaranê kurdan yê ûnîversîte meseleyê kurdan ra eleqedar bîyêne. Kamîl komeleya Rizgarî û ci ra pey zî Ala Rizgarî de aktîf xebetîyayêne.

La reya verêne ma kam cayê Anqara de û senîhawa yewbînan şinasna vîrê mi de nêendo. O wext şûbeyê çend komeleyanê

kurdan Anqara de est bîy; vêşaneyê endamanê nê komeleyan zî wendekarê unîversîte bîy. Mebênê nê komeleyanê kurdan de dîyalogedo baş est bi. Ez ge-ge nas û dostan reyde şîyêne nê komeleyan.

Sewbîna zî taxa Kızılay de bi nameyê “Yenişehir Kırathanesi” qewexaneyêk est bi, tayê wendekarê kurdan yê çepgir û welatperwerî şîyêne weyra. Yewna ca, nêzdîyê nê qewexaneyî est bi; ci ra vajîyayêne “Zafer çarşısı”. Nê çarşuyî de tewir- tewir dikanî est bîy: çayxane, pastaxane, qirtasîyeroş, dikanê cilan ûsn. Dikanê kitabana yê kek Umît Firatî nê çarşuyî de bi; mabêne wendekaranê çepgir û kurdperweran de zî yew cayo bellîbîyaye bi.

Ez mabênê serranê 1976 û 1979î de Anqara de menda. Kamîl ge-ge ameyêne komeleya ke ez endamê aye bîya, bêxeyra mi sewbîna nas û dostê ey weyra est bîy. La zafane qewexaneyoy ke

mi cor de behs kerd, ma weyra yewbînan dîyêne.

Hamnanê serra 1979î de ez kewta hepisxaneyê Mamaqî yê Anqara. Ez çend hewteyî tayê nas û dostan reyde hepisê Mamaqî de menda. Ê rojanê ke hinî ma hepis ra vejîyêne, ma xebere girewt ke endamê komeleya Ala Rizgarî ra çend tenî do bêrê cayo ke hepisxane de ma tede bîy.

Endamê komeleya Ala Rizgarî ra çend kesî amey, Kamîl zî tede bi. Verê ke bêrê hepisxane çend hewteyî qereqolê polîsan yê Anqara de mendibî. Zaf giran îşkence dîbi. Ma hetkarîyê înan kerd, yanî çi destê ma ra ame ma texsîr nêkerd. Mi înan ra hîna weş Kamîl şînasnayêne. Sîyaset ra teber, ez û Kamîl ma dostê yewbînan bîy. Çend rojan ra pey ê kesî ke ez reyra kewtîbî hepis, qaso ke vîrê mi de mendo, hewna ma pêro pîya hepisê Mamaqî ra vejîyayî. Yanî ma çend rojan ra pey xatir Kamîl û embazanê ey ra waşt.

Rewna bi ke cuya mi ya Anqara mi rê bêtehm, zaf bêtehm ameyêne. Ez ke hepis ra veradîyaya, zaf nêramit mi Anqara de dest bi karê xo yê banka ra, mektebwendîşî ra

û sewbîna çîyan ra verada û şîya Dîyarbekir. Ez welat de qasê serre û nê menda; ci ra pey şîya Sûrîye û Lubnan. Mi hinî ne Kamîl dî û ne zî ey ra xebere girewte.

Welhasilî, tewir bi tewir zor û zehmetîyan ra pey ez sereyê serra 1989î de Sûrîye ra ameya Swêd. O wext, ê însanî ke sey multecîyan ameyêne Swêd verê tayê cayanê muweqetan de mendêne. Nê cayan ra vajîyayêne "kampê multecîyan". Nê kampê winasî, zaf şaristananê Swêd de est bîy. Stockholm de wina yew ca est bi, ci ra bi zîwanê swêdkî vajîyayêne "Carlsson Flyktingförläggning". Gelek welatan ra însanî na kampe de mendêne. Aye ra seba ke dîyalogêdo baş mabênê multecîyan û swêdîyanê ke na kampe de xebetîyêne bibo, îhtîyacê berpirsîyaranê kampe bi tercumanan est bi.

Na kampa multecîyan de kek Elî Çiftçî sey tercumanê zîwanê kurdî xebetîyayêne. Tercumanêdo baş bi. Kek Elî ê rojanê verênan de Swêd de heqê mûltecîyan ser o û sewbîna tayê çîyanê bînan de gelek melumat da ma.

Kek Elî qezaya Cîhanbeylî yê Konya ra yo. Seke yeno zanayêne

kurdê ma derûdorê bajarânê sey Anqara, Konya, Nîgde û Qeyserî de ciwîyêne. Nê kurdê ma zafane bi kurdê Anatolîyê zî name benî. Nê kurdanê ma ra, zaf keyeyê Stockholm û sewbîna bajarânê Swed de est ê. Zaf xebatkar û welatperwer ê. Yewna xususîyetê înan yo baş, giredayîye urf û adetanê xo yê. Wexto ke ez Anqara de mendêne mi tayê kurdê mayê ke derûdorê Anqara û Konya ra bîy, şinasnaybîy. La hîna nêzdîyê ra mi nê kurdê ma Swêd de şinasnay. O wext zî, kek Elî Stockholm de bi nameyê "APEC TRYCK & FÖRLAG AB" çapxaneyê xo est bi; bi ziwanê kurdî kitabî, kovarî û sewbîna çîyî zî çap kerdêne.

Eke ez xelet nêba, Kampa Multecîyan yê Carlssonî de hema roja mi ya verêne bî. Kek Elî mi ra va: "Na kampe de, yew kurdê mayo dîyarbekirij zî maneno." Miheqqeq mi nameyê ê kurdê ma ra teber derheqê ey de sewbîna çîy zî Elî ra pers kerdîbi. Bi nameyê Kamîlî, çend şinasîyê mi yê dîyarbekirijî est bîy. Labelê mi binde gumanê embazê xo Kamîlo ke ez do bineyna pey veyna, nêkerdîbi.

Eynî roje bi, sewbîna roje bi nika vîrê mi de nêmando; seba werdê mexrebî, ez û Elî ma şîy aşxaneyo ke seba ma multecîyan kampe de est bi. Ma her yewî tepsîya werdê xo girewt û şîy yew cayo musaîd de ronîştî. Aşxanê xişn bi, bineyna pey camêrdêk tepsîya werdê ey ey dest de hetê ma ya ameyêne, la ma ra hema dûrî bi. Kek Elî va: "Şarê mayo ke ez behsê ey keno o yo, ti şinasnenî?" Mi nêşinasna.

Labelê têbestîşê ey hîna zaf bala mi antibî: Camêrdêdo sîyatale (dûrî ra wina asayêne), yew paltoyo sîya pira, gojagê (qumça) paltoy texteyin û sipîlûç bîy. Her gojage, qasê yew engîştâ însanî derg û qalind bî. Paltoyo ke pira bi, ey rê gird ameyêne, seke tede biney vindî bibo. Çîyo balkêş rayîr ra ameyîşê ey mi rê xerîb nêameyêne. Tepsîya werdê ey ey deste ame ma het ronîşt. Silam da, ma yewbînan şinasna.

Kamîl (Sümbül) bi. Seke mi cor ra behs kerd, hamnanê serra 1979î de ma pîya hepîsxaneyê Mamaq yê Anqara de mendî. Hende wext ra pey ma yew ca û yew rewşe winasî de rastê yew-

bînan amey. Dades serrî bibî ke, ma ne yewbînan dîbi û nê zî yewbînan ra xebere girewtibî.

Hema zî ha vîrê mi de yo. Ez bi meraq Kamîlî ra persaya: "Mi ra pey ti key hepisê Mamaqî ra vejîyay?" Kamîlî her di destê xo masa ser ra biney berz kerdî û nata- bota têşanay û va: "Ez hepisê Mamaqî ra berda hepisê Dîyarbekir û ez pêro pîya nêzdîyê panc serrî û nê hepis de menda. Cazaya mi qedîyaybî la ez yew serrî zî vêşî hepis de menda, yanî dewleta ez hepis de xo vîra kerda."

Çetale û kardî destê ey de bîy, xo dest ra ronay; biney behsê hepisê Dîyarbekirî kerd. Mi fehm kerd ke dewleta tirkan işkenceyo zaf giran ey zî kerdo; çunke xebere mi zî sey nas û dostan barbarîya (hovîtî) ke hepisê Dîyarbekir de bibî, est bî. Kamîl hem mexdur hem zî şahidê ê zulm û hovîtîya ke hepisê Dîyarbekir de bibîy.

Derheqê zîndanê Dîyarbekir de heta ewro zaf kitabî nusîyayî û sewbîna zî zaf çîyî neşir bîyî. Seba ke winasî zulmê giranî vîrê kê ra nêşêrê, ewro komunîkasyonê efektîfî est ê; înan ra yew zî Xanî

TV ya. Dokumanterêk bi nameyê "Cehenem ne ki", çend serrî nay ra ver Xanî TV` de weşanîya. No dokumanter YouTube de qeydkerde yo, yanî ez wazena vaja ke zulmo ke zîndanê Dîyarbekir de bîyo, hinî vîrê kê ra nêşonu. Xorahovan ra heyfgirewtişo tewr pîl xovîranêkerdiş o.

Kamîl hepisê Dîyarbekir ra pey, ganî di serrî zî Sîwas de surgun de bimendêne. Kamîlî Sîwas de zaf tewirî ra zor û zehmetî dîbî; weyra zî polîsan teda (ezîyet) bide kerdibî. No mabên -wexto ke Sîwas de yo- de Kamîl wazeno bi qaçaxî Tirkîya ra vejîyo şêro Yunanîstan. Nêzdîyê bajare Edirne de, şewe, hudud de eskeranê tirkan reyde pêrodayiş vejîyeno, Kamîl tepşîyeno. Hewna keweno hepis, labelê na rey zaf nêmaneno.

Mi çîyêk xo vîr ra kerd, muhîm o: Seke mi bineyna ver behs kerd ez çend şinasîyan reyde hamnanê 1979î de qasê mengêk hepisê Mamaqî de menda. Hepis de, ma xebere girewt ke endamanê Ala Rizgarî ra çend kesî do bêre qawîşa ma. Ma hazirîya xêrameyîşê înan kerd. Amey, keyfê ma yewbînan rê ame.

Qaso ke vîrê mi de mendo, seba werdê mexrebî, ma Kamîl û embazê ey dawet kerdî. Ma pêro pîya dapancês kesan dest pêkerd werd wenî. Kamîl hem werd weno hem zî g-ge sereyê xo werd ra berz keno, vano: "Werdê revîzyonîstan ganî kê nêwere." Werdê xo ke werd, ci ra pey hem çay hem cixara waşte, ma îkram kerd. Yanî ez wazena vaja Kamîl yew embazo yaran bî zî. Mi no vate "Werdê revîzyonîstan ganî kê nêwere", des serrî ra pey Swêd de aşxaneyê multecîyan de Kamîlî vîre vist, ma pey keyfweş bîyî.

Des serrî emrê însanî de kilm nêhesebîyêno. Aşxane de o mexreb ma epey çîy-mîyî yewbînan ra persay. Ma xora dostê yewbînan bîy, ma Swêd de hîna bîy nêzdîyê yewbînan. Kamîl zaf nêbedilîyabi labelê hepisê Dîyarbekirî de zaf hedîseyî amebîy seredê ey ser. Ê mi zî, teberê hepisan de, sey sewbîna tayê nas û dostan zaf çîyî amebîy mi zî sereyî ser de. Qehir û qotikê nê des serran ma ser o tesîr kerdibi.

Ez û Kamîl qasê hîrê hewteyan Kampa Multecîyan yê Carlssonî de yew keye de pîya mendî. Ci ra

pey ez şîya bakurê Swedî, şaristanê Kramforşî. Zimistan bi, serd bi, heme ca vewre ra sipsipî kerdinî la cayo ke ez tede mendêne germin bi. Mi ra pey zaf nêramit Kamîl şî bajarê Avesta.

Kamîlî Swêd de girewtişê destûrê ronîştîşî ra pey, zaf nêramit xo rê gure peyda kerd; sewbîna çîyan ra zî apey nêmendêne. O wext Stockholm de ronîştêne. Merkezê Federasyona Kurdan, Stockholm de bî; hinîke qisman de aktîf xebetîyayêne. Bi na xebata xo reyde sewbîna cayanê Kurdîstanî ra kurdê ma şinasnay.

Ez zaf derg nêka, ez û Kamîl ma sewbîna tayê bajarê Swedê yê bînan de zî mendî, la ma di- hîrê serran mîyan de amey Stockholm; yanî ma hewna amey nêzdîyê yewbînan. Ê ma her dîyan zî zafane nas û dostê ma Stockholm de ronîştêne. Çapxaneyê kek Elî Çiftçi "Apec Tryck & Förlag AB" taxa Spånga de bi. Kamîl weyra xebetîyayêne. Qay hewna tesadûfêk bibi, bano ke mi kîra kerd zaf nêzdîyê cayê karê Kamîlî bi.

Her wexto ke mi îmkan bidîyêne ez şîyêne çapxane, yanî

cayo ke Kamîl tede xebetîyayêne. Weyra mi wayîrê çapxaneyî kek Elî û birayê ey kek Mecîd hîna nêzdî ra şinasnay. Xebata çapxaneyî de kek Mecîd westa bi, zaf faydeyê ey bi zaf hawayan ra Kamîlî resayêne. Kamîl hem xabatkar bi hem zî derheqê xebata çapxaneyî de meraqê xo est bi, yanî waştêne baş bimusos. Herçiqas ez weyra nêxebetîyayêne zî yew deme ez zaf şîyêne weyra.

O wext zî, hima vajên heme cayanê Kurdîstanî ra kurdê ma Stockholm de est bîy. Ê kurdê mayê ke yew hawa de eleqeyê înan bi nuştîşê kitabana, kovaran û sewbîna nê babet çîyan a bibîyêne, ameyêne çapxaneyê Apec. Sewbîna cayanê Swêdî ra zî însanê ma ameyêne. Cayê karê Kamîlî de, mi zî epey kurdê mayê ke sewbîna cayanê Kurdîtanî ra bî, şinasnay.

Kamîlî çend serrî çapxaneyê Apec de xebetîya. Zaf nêramit zewecîya, wayîrê keye û kulfetî bi, demêk ra pey waştêne serbest bixebetîyo. Stockholm ra bar kerd şî nêzdîyê bajarê Kalmarî. Weyra serbest xebetîyayêne: Werdxaneyê ey est bi, heq ra ameyêne. Çend

serrî Kalmar de mend, la hewna apey ame Stockholm.

Şîrketo ke ez Stockholm de tede xebetîyayêne, Kamîlî weyra dest bi xebate kerd; şîrketodo pîl bi. Hima vajên her roje cayê karî de ma rastê yewbînan ameyêne. Ez ge- ge Kamîlî ra persayêne, eceba karê xo ra memnun o. Sere de karê xo ra memnun bi, keyfê mi zî ameyêne. Kamîlî karê xo dîqet kerdêne; wextê xo de ameyêne kar, embazanê xo reyde weş xebetîyayêne.

Şîrketo ke ez û Kamîl tede xebetîyayêne zaf-zaf mişterîyê xo est bîy. Zaf kemî zî bibo ge-ge kê rastê tayê kesanê nerehetan zî ameyêne. Yew deme ra pey Kamîlî waşt hewna serbest bixebetîyo. Wextêk ra pey şî hetê başûrê Swêdî de nêzdîyê bajarê Wäxjö; weyra aşxane xebetnayêne. Ma xebere yewbînan ra girewtêne; wexto ke biameyêne Stockholm ma yewbînan dîyêne. Kamîl her reya ke biameyêne Stockholm, miheqqeq şîyêne çapxaneyê Apec.

### **Mecîd westa zî şî rehmet**

Kamîlî ra pey emser (2025) Mecîd westa zî şî rehmet; aye ra

ez wazena biney behsê ey bika: Qaso ke vîrê mi de mendo, Stockholm de cayê çapxaneyî hîrê reyî bedelîyayo. Nê heme hîrê cayan de Mecîd westa xebetîya, hertim cayê karê de harmonîyêka zaf weş est bî. Na harmonîya weşe de para Mecîd westayî zaf bî. Ma êyê ke ey şinasnenî ma do zaf berîya nê însanî başî bikî. Tayê însanî est ê, hişê (vîr) kê de yew tesîro weş û pozîtîf verdanê; Mecîd westa yew însano winasî bi.

Ez û Kamîl embazê yewbînani verên bî, seke bi zivanê tirkî vanî "ma senlî, benlî bî", yanî ma ge-ge yewbînana kewtêne, yarenî kerdêne. Wexto ke Mecîd westa huzuran de bibîyêne yarenîya ma hîna zaf weşe biyêne. Zafane, wexto ke ma bişêyênê mêmanîya yewbînan, yan zî mitbaxa çapxaneyî de mabênê çay û qawayê diyayêne, yarenîya ma weşe biyêne. Kek Mecîd û Kamîl çapxane de pîya yew qisim de xebetîyayêne. Kamîl zaf xebatkar bi. Labelê sey sewbîna zaf çîyanê xo, xebata xo de zî ecele kerdêne. Mecîd westayî no xuyê Kamîlî zanayêne, bi peşmirîyîşî xoyê weşî reyde hertim hetkarîya Kamîlî kerdêne.

Nê çend serranê peyênan de min û Mecîd westayî ma yewbînan nêdî; qay qismet nêbibî. Ez ke pêhesîyaya Mecîd westa şîyo rehmet, ez zaf xemgîn bîya. O newêse menga nîsane 2025î de şî rehmet. Labelê sohbetê mayo ke mitbaxa Apec Tryck de biyêne vîrê mi kewt. Seba tezîyeya Mecîd westayê ez şîya çapxaneyê Apec, weyra ma hewna o ard vîrê xo. Ruhê ey şa bo.

\*\*\*

Seke mi cor ra behs kerd, Kamîl reya peyêna ke Stockholm ra vejîya, şî nêzdîyê bajarê Wäxjö. Hinî weyra ra sewbîna cayan nêşi. Nê serranê peyênan de, ge-ge behsê neweşîya xo kerdêne. Seba kontrolî ge-ge şîyêne xestexane; ez ke persayêne, vatêne: "Çîyo xirab çin o." Wexto ke kê emrê min û Kamîlî de bîy, zaf ra tayê xora kê de nêweşî vejîyêne. Mi zî sere de derheqê nêweşîya Kamîlî de yew texmîno winasî kerdibî.

Labelê sereyê serra 2023î de ame Stockholm; mi ferq kerd ke rewşa ey baş nîya. Ez persaya, ey zî behsê nêweşîya xo kerd. Mi ra va: "Mi kek Elî Çiftçi ra vato, rojê çî mi bibo, çî îcab bi-

ko Elî keno.” Mi zî ci ra pey zaf reyî Kamîlî rê telefon kerdêne. Nêweşîya xo de çend reyî ame Stockholm, her reya ke ameyêne ma yewbînan dîyêne.

Nêweşîya Kamîlî de, wexto ke ma yewbînan dîyêne yan zî ma yewbînan rê telefone kerdêne, bêxeyra sewbîna tayê çîyan, mi ge-ge behsê yew belgefilm ke mi TV` dîbî, kerdêne. Zaf weşdê ey şîyêne, aye ra ez wazena tîya de bi kilmî behsê na belgefil bika:

Mi dadesî serrî naye ra ver TV` de temaşe û goşdarîya yew belgefilm kerd. Nê filmî de botanîknasêk behsê tayê nebatan û lemanê ke Çolê Sahara de benî (ware yenî), kerdêne. Seke yeno zanayêne, qisimo herî pîl yê vakurê Afrîka bi Çolê Sahara name beno. Belgefilm de, derheqê tayê nebatan û leman de hem bi nawîyayîş (vîsuell) hem zî bi fekkî (verbal) melumat dîyayêne.

Nê belgefilmî de, Çolê Sahara de yew ca nîşan dîyayêne, hema vajên tede dijne (varan) nêvarayêne. Weyra de çend tewîrî ra çend lemî nîşan dîyayêne. Hem xususîyetê cayan de û hem

zî xususîyetê sewbîna nebatan de zî melumat dîyayêne. Seke mi va behsê zaf nebatan bîyêne, la yew nebatî yan zî kê şênê vajî yew “leme” bala mi zaf antibî. Nameyê na leme zî dîyayêne, la nemyê aye vîrê mi de nêmando. Nê çêşît leman ra yew- di hebî belgefilm de nîşan dîyayêne: Leme zerguneya xo de, yanî kok de xo ser o zaf şaxan dana, hîra û kesk bena. Huşkeya (merg) xo de nê şaxê leme ancênî pêser benî gilover sey yew guda zaf xişne.

Belgefilm de nê çêşît leman ra yew lema ke teqrîben se serran ver huşk bibî, nîşan dîyayêne. Qaso ke belgefilm ra vîrê mi de mendo, nê se serran de reyeyê (rîçik) leme zî tayê ci ra puçî bibî. Firtineyo zaf xedar na leme kok ra qerefneno. Firtine na lema huşke cayê aye yê vîrên ra zaf- zaf dûrî fineno. Semedo ke leme kok ra qerefiyaya bena, hinî her firtineyê pêti de cayê aye bedelîyeno.

Axirî leme kewena yew ca ke tede ge-ge dijne zî varena. Dijne ke varena, zaf ra tayê çî hende wext vîyereneno, vîrê mi de nêmando. Labelê lema ke se serr-

ran ra ver huşke bîya, cayê xo yê newe de "ganî" bena: Yanî leme ard ro reyan war kena, ê qirmê huşkî ke ardî ser o yê cê ra abenî û xelfe danî; leme Çolê Sahara de, hewna bena kepûkeske.

Mabênê rastî û henekan de, mi behsê na belgefilm reyra waştêne Kamîlî ra vaja ke merg ra pey bi yew hawa ganîbîyayîş zî est o. Eke merg ra pey tayê çiyî sey leman zî merg ra "ganî" bibî, ê çiyê ke hetanî nika no babet de derheqê mergê însanan de vajîyay û nusîyay ganî peygoş nebî.

Kamîl reya peyêna ke ame Stockholm, ma pîya şî baxçeyê mamosta Nebî (Bal). No baxçe semtê Södermalmî de cayêk est o, bi "Södra Årstalundens Koloniområde" name beno, weyra yo. Kek Nebî însanêdo kurdperwer û mêmanperwer o. A roja ke ma şiyê baxçe, kek Xalit (Îkram Delen) zî weyra bi. Ma baxçe de gelek wext mendî; kê wextanê winasîyan de keyfweş benî. Baxçe de asin ra dîrega ala est a; ala kurdî dûrî ra zî weş asayêne. Ma perunê pîya binê ala kurdî û sewbîna cayanê baxçeyî de rismê xo kaşkerdî. Kamîl yew-

di rojî ra pey şî Wäxjö; hinî ma rî bi rî yewbînan nêdî.

Zaf ra tay di mengê verê mergê Kamîlî, wexto ke ma telefonê reyde qalî kerdêne ge-ge vengê ey baş nêameyêne. Aye ra bêxeyra telefonkerdişî, ma e-mailê reyde zî yewbînan ra xeber girewtêne.

### **Mergê Kamîlî**

Kamîlî bajarê Wäxjö yê Swêdî de, yewendesê menga sibate 2024 de dinyaya xo bedilnaye; la paytextê Swêdî Stockholm de defn bi. Tezîya ey Stockholm de "Kista Träff" de bî. Gelek însanî ma amey cayê tezîye. Kek Elî Çiftçî û kek Xalitî (Îkram Delen) derheqê cuya Kamîlî de qalî kerdî. Keyeyê Kamîlî ra keynaya ey Bewrane behsê pêrdê xo kerd.

Yew- di rojî tezîya ra pey cenazaya Kamîlî arde Şaredariya Solna de goristanê "Solna Kyrkogoård". Nê goristanî de cayêk est o, ci ra vajîyeno "Norra Kapellet"; cenazaya Kamîlî arde weyra. Tabutê cenaza çikspî û serê aye pîrrê gulî bî. Ma epey wext Norra Kapellet de mendî. Weyra zî kek Elî Çiftçî, kek Xalitî (Îkram Delen) û Gruba Xebate ya Vateyî ra ma-

mosta Îhsan Esparî derheqê heyat û kurdperwerîya Kamîlî de qalî kerdî.

Gelek nas û dostî ameybî Norra Kapellet; zafê înan camêrdî bîy la cinîyî zî est bîy. Zafê nas û dostan rîsipî bîy; xora embazê ma Kamîlî zî rewna bi ke cuwaneyî xo ra pey verdaybî. Çapxaneyê Apec ra Peppîna û kek Elî Çiftçî hazirîyêk baş û balkêş kerdibi. Seke mi cor ra va, wexto ke Kamîl çapxane de xebetîyayêne ez hîna zaf şîyêne weyra. Ma ge- ge zî bi keye û kulfetê xoya bîyêne misafirê yewbînan. Ge-ge zî adetan ra yo, kê yewbînan reyde resiman zî kaşkenî; winasî zaf resimê ma est bîy.

Norra Kappellet de, kîştê cenazaya Kamîlî de ekranêk est bî. Teqrîben dasey resimê Kamîlî ke nas û dostanê xo reyde vetîbîy o ekran de nawîyayêne. Înan ra dadesî resiman de, ma çend tenê pîya bîy; yanî ferdê keyeyê Pepîna û kek Elî, kek Mecîd, Kamîl û ez tede bîya. La resimê ma yê verê dahîris serran bîy. Bi zaf hawayan ra keyfê mi ê resiman rê ame.

Tabutê cenazaya Kamîlî masa ser o bi. Mi nîyada ke tayê însanî

ma ha tabutê cenaza ser o tayê çîy-mîyê nusenî. Mi ê çîyan ra tayê wendî, weşê mi şî. Mi waşt ez zî çîyêk binusa, ez qederêk fikirîyaya, ci ra pey mi resimê yew gule tabutê ser o viraşt. Bi zîwanê swedkî na gule ra vajîyeno "Vîtsîpa".

Seba cenaza, çîyo ke ganî Norra Kapellet de bibiyêne, tamam bi; cenaza weyra ra girîyayê û ma pêro pîya hetê cayî defnkerdişî ra şîyî. Cayê defnê cenaza hazir bi; weyra Kawanî (lajê Kamîlî) qalî kerd.

Badê defnkerdişî cenaza, hima vajîn ma pêro pîya şîyî taxaTelefonplan de loqanteyêk bi nameyê "Restauran Add Food". Weyra zî bêxeyra tayê nas û dostan Monica û kek Selîm Uzunî qalî kerdî. Kek Selîm Xarpêt ra newe amebi. Qay yew embazê Kamîlîyo ke Xarpêt de maneno Kamîlî rê şewqayêk xususî ya xarpêtijan se hedîye şaweno. Kek Selîmî derheqê Kamîlî de bêxeyra sewbîna çîyan behsê hedîyeyo ke ez behs kena, kerd. Labelê hedîye Kamîlî ser nêresabi.

Monica swêdij a. Kamîl peynîya serra 1988î de, ez zî sereyê serra 1989î de ameya Swed. Seke

mi co ra va, ez û Kamîl ma çend hewteyî Kampa Multecîyan ya Carlsson de mendî. Monica a kampe de xebetîyayêne; însanêda xerîbdoste bî, o wexto kilm de zaf hetkarîya min û Kamîlî kerdibî. Ez ke weyra ra şîya, hema vajên mi hinî Monica nêdî. Kamîlî eleqeyê xo dewam kerd; yanî eleqeyê înan nêbirîya. A roje, ma hinde serran ra pey yewbînan şinasna.

Nêweşîya Kamîlî de, seke mi bineyna ver va, mi ge-ge ey rê e-mailî zî şawitêne; înan ra di e-mailî payênê:

”Merheba Kamîl, ti senîn î? Ez hêvî kena ti baş î. Ez hetê e-rey ra to rê telefon kena. Bimane weşîye de.

Merheba Kamîl, rojî vera-vera Swêd de benî roşnî. Ha ha wisar o. Bi harmonîya rengan, heme ca do weş bibo. Ez hêvî kena, ti xestexane ra weşûwar vejî. Bimane weşîye de.”

Kamîlî cewabê e-mailê minê peyênî zî da, nuştbi: ”Ez baş o, ez ha xo vero dana.” Labelê Kamîlî yew roje ci ra pey wefat kerd.



Hamnanê Stockholmî ra dîmenek: Ez, Kamil, Elî, Mecîd û Kaj

# ROJNIVÎSK 4

## Bêrîvan Keskîn

Qirç, qirç, qirç. Dengê lamînatan!

Şûr, şûrr, şûrrr. Dengê avê!

Xwedê xêr pênekiriya cîrana min dîsa jî şeveqê de dest bi paqijiya malê kiriyê. Xêrê bi meriyan nakin, em ji xwe re tenekî rakevin. Ku fedî nekim ez ê aniha rabim herim ber deriyê ve! Ka çi di mala wê geriyayê! Her roj ji şeveqê de bi erd û dîwarên vê malê ketiyê?

Qirç, qirç, qirç. Şûr, şûrr, şûrr.

Erê erêêê, tu tenê jina mala yî! Tu tenê jîr û jinî! Ew du salin req û teqa te bi ser min de ye! Ma gû di mala te geriyayê, hii, hiii ka bêje ma gû di mala te geriyayê?

Dengê paqijiya cîrana min ji nişke ve ker bû. Şikur ji Xwedayê mezin re! Ez gêj kirim ve şêtê.

„Ev çi qîreqîra te yê? Tu dîsa bi kê re şerê çi dikî?“ Destê Sonê ye bi qolê derî girtî ji min ve xûya bû.

Qey, min bi dengê bilind deng

dikir? Hey wax! Gelo cîrana min a jîr loma xwe ji nişke ve ker kirîbû?

Tu ji şeveqê de hatî çî Sonê? Ma kurmê cîrana min bi te jî girt?

„Baş ê ku ez hatim e. Heger min xwe negihandiya we, welê te û cîrana te we bi qirika hevdi bigirta.“

Bi ser gotina Sonê de ken bi me girt.

Req û teq! Req û teq!

Sonê, Welê cîrana min dest bi şerê sar kir. Kûrsiyan radike û dîtene. Tu dibizî ne wengê Sonê? Ka bêje, ma ev heqê? Her roj halê min ji dest vê jinikê ev e.

„Şer şer e, çî jina jîr çî jina bi xwe re nedîtî!“ Sonê qerîya.

Hiii çend sloganên din jî bavê, bila ez û cîrana min derkevin pêş malê û şerê xwe germ bikin!

Sonê ya di ev gotina te de, ya bi xwe re nedîtî ez im gelo? Sonê xwedê şaş nekiriye! Tu bi xwe jî

dizani ez ji ciwaniya xwe ve yê dixebitim. Te çi tîraliya min dîtiyê nizamim lê dapîra min digot mala min kirî xelkê dît hûn jî mala xwe bikin bila xelk mala we kirî jî bibîne! Hiii, de kerem bike Sonê xanimmm.

„Heger tu ewqas jîr û jêhatiyî, ew hefteyekê tu çima naçî kar?“

Ez nexweş bûm. Serê min dêşiya, çend rojin deng ji qirika min nayê derê.

Tîqetîq bi Sonê ket.

Tu bi çi dikenî xanimê?

„Qîrîna te ji dervê de dihat bihîstin, icar qirika min dêşê!“

Pirxinî bi me herduyan jî ket. Teq û reqa qatê jor jî bilind bû.

Sonê hişbe keçê, hindik mayê jinik malê bi ser serê me de hilweşîne.

Dema haya Sonê ji nexweşiya min bûye, li xwar hatibû mala min. Li ser rêya xwe jî dagerîbû dikanekê û kîloyek portaqal kirîbû. Em bi hevûdu re derbasî aşxaneyê bûn. Sonê portaqal ji tûrik derxistin û li ser maseyê di sênîyekê de bicih kirin. Pêra jî bi tilîyên xwe yên zirav û dirêj rahişt portaqalekê, ji sênîyê derxist û bi carekê re spî kir. Lê Sonê çavên

xwe qet ji ser min nedibirîn. Cara pêşî bû ku Sonê min bi vî halî dibîne. Dev û levên min kul bûbûn. Berê çavên min li min reş bûbûn. Ji xwe haya min ji porê li serê min gij bûyî û pêjîmayê ku êdî bêhna xewê dayî tuneyê. Haya Sonê jî ji rastiya min tuneyê, turikê portaqalan kiriyê û hatiyê serdana hevala xwe.

Dema wê bifikar destê xwe yê ku bîhna portaqalan jê belav dibû li rûyê min ê spîçolkî bûyî digeland û bi quretîya bijîjkekê digot, „ger tu van portaqal bixwî wê heya sibehê tiştêkî te yê nemîne.“ Wê keliyê ez mîna pela ber bê ketî, bi ber bîhna portaqal ya ji destê Sonê berbelav dibû ketibûm, berve zaroktîya xwe ve;

Zivistan bû û ez dîsa nexweş ketibûm. Her sal dema, biqasî erdê berf digirt, laşê min jî nexweş digirt. Qey nistiyek bû. Berê qirika min dêşiya. Piştîre îltihaba ku di qirika min de digêhişte hevûdu li temamiya laşê min belav bûbû. Qirika min ewqasî dêşiya ku qurta avê jî pêda nedîçû xwarê.

Dayika min li dora min diçû û dihat, destê xwe li rûyê min digeland. Her ku rûyê min bi wê

germ dihat, li sobeyê vedigerî û agirê di sobeyê gêştir dikir. Her ku wê agir gêş dikir, ez jî di binê lihefê de, bi têsîra agirê sobeyê bêhtir nexweş dibûm û ji hevêdu diketim.

Dayîka min jî ji xwe re kiribû nistî û menfeeta xwe dikir agirê sobeyê. Dema agirê sobeyê ji bo min gêşdikir. Gumgumên avê didan alîyekî sobeyê û beroşa bîhna şîvê jê difûrî dida aliyê din yê sobeyê. Bilez hevîr distira dida kêleka sobeyê, dema hevîr tîrş dibû, goga hevîr di gogê nedige-hand, nan li dûv nanê dipêjand û davêt firina sobeyê.

Bi gotina ” Vê keçîkê îro tiştin xwar?” Min çavên xwe vekirin lê mêjîyê min bi êşê xilmaş bûyî di xewka giranda bû. Kevçiyê şorbeyê ye berve devê min ve dirêj bûbû hindûrê min lihevdiwest. Dapîra min kitana xwe ya spî di serê xwe werdabû û bi hinarikên xwe yên ji xema min sor bûyî bangî min dikir ”Keçka min devê

xwe veke, bixwe, bixwe ku tu baş bibî! Qet weng dibe kerê? De rabê keçka min, Serê xwe rake!”

Bîhna portaqalan! Laşê min ê li ber agirê sobeyê xilmaş bûyî, bi bîhna portaqalan bi xwe de hat. Bêyî ku çavên xwe vekim û serê xwe ji ser balgî rakim, min bavê xwe dişopand. Çawa ketîbû hindurê malê, berê hatîbû ba min. Ji cil û bergên wî hinjî hilma sar a berfê belav dibû. Serê pozê wî ji sermayê sor bûbû, dema bi ser min de bi xwar ve hat û li rûyê min mêyzand, pozê xwe yê ji serma cemidî bi piştê destê mist da. Paşê li ber serê min rûnişt, porta-qaleke biçûk xist kefa destê xwe yê çepê bi serê tilîyên destê xwe yê din jî portaqal spî kir. Bavê min destê xwe di rûyê min da „Narîn! Narîn! Rabe keçka min, min ji te re portaqal anîn.“ Dema wî destê xwe di rûyê min dida, min bîhna portaqalan ya ku xwe dayî destê wî dikşand nava xwe û hinava min dibû baxçeyê portaqalan.

# JI BO KESÊN KU DI KELQÎJA HAVÎNÊ DE DICEMIDIN

(Di hinava min de kesekî din heye, dizanim)

## Mistoyê Heco

Bajarek hebû,  
hêj heye? nizanim.  
Hen cih jixwe di hinava meriv de  
hergav dijîn,  
bêdeng, bi israr wek ku cihekî  
wusa qet tune be...  
Ez îro li cihekî weha hişyar  
bûm—  
hişyarbûn bû ev? nizanim.  
Belkî jî tenê çavên min  
vebûbûn— lê rihê min?...  
...mişt tarî ye.  
Ji zû de ye dengê xwe nabihîzim.  
Gava hinava min deng da û  
palikên çavên min vebûn, qet  
neçû xofa min.  
Bi tenê westiyayî bûm.  
Qey dibêjî ji mij ve ye bê deng  
bûm û cara ewil bû ku min  
mejiyê xwe ber bi peyvan ger  
dikir...  
Di hinava min de dengê:  
"Meriv nikare li vî bajarî xeyalan

bibîne."  
Û bêdeng bersivê didim:  
"Ger meriv ji xwe re xeyalan  
nesêwirîne dê çawan bikaribe li  
vir bijî?"  
Derdikevim şanaşînê,  
hewcedariya min bi dengê  
heye— belkî jî bi lerezê...  
Li jêr, Alîsa xaliyê tev dide—  
zarok her gav tiştinan digerin.  
Min çî yê xwe vindakiribû?...  
nizanim, lê tiştê ku wan destên  
biçûk di nav axê de lê digerî di  
jiyana min de jî kêm bû.  
Di hinava min de pistepistek:  
"Wextekî te jî ax dikolî. Tu jî li  
tiştinan digerî...bîne bîra xwe."  
Lê bi bîr anîn zehmet e, merivan  
diwestîne. Gava meriv hin  
bîranînên xwe bi bîr tîne çavên  
xwe kîp digire û wê demê di  
valahiya çavên xwe de, li dar dixê.  
Û bêdengê...

Di hinava min de tişteke diteqe—  
belkî jî tirs e, ev.  
Ji bêdengiya bîranînan ditirsim.

Van rojên dawîn bi tenê li destên  
merivan dinêrim. Dîmenên din  
hemû bi min vala tîn— belkî jî  
dest nikarin kirinên xwe veşêrin  
lewma...

Bi hêdîka pêlî axê dikim:

"Xuşş"

Hinekî din hewl didim:

"Xuş, xuş, xuşşşş..."

Ev xuşexuş ne aîdî vî danî ye.

Olana salan e, di bin lingên min  
de dixuşe...

Xwe bi xwe dibêjim:

"Gelo heta niha min...

...şopa lingên min ...

...li ser rûyê erdê..."

— hêj peyvên min nagihîjin hev  
û nabin hevokeke dirist bayek  
radibe û hemû şopa ramînen  
min dialise.

Pûffff...

Di wê kêliyê de min xwe gîhand  
kê? Ji kê kê m bûm?— ba her tiştî  
jê dibe...

Cixareya min di nav lêvên  
min de nîvco — miriyê, Xwedê  
jî li ezmanan... Gewrahiya  
ezmên hêdî hêdî ber bi reşahiyê  
vedigere. Ez hêj li vir im.

Du evîndar nêzî min dibin û  
dixwazin ez bi telefonê sûreteke  
wan bigirim, lê ji wan lêborîna  
xwe dixwazim û dibêjim destên  
min zehf dilerizin nikarim  
sûreteke baş bigirim. A rast  
destên min nalerizin, tenê  
naxwazim wê demê bikujim.— di  
hemû demên mirî de ez heme,  
naxwazim lê zêde bikim. Bila ev  
jî nîvco bimîne.

Hêj pistepista hinava min e:

"Jixwe tu tim ji tiştên nîvcomayî  
hez nakî?"

Mafdar e.

Cixareya min?

Ez ji tiştên ku temambûyî ne,  
tiştên ku nîvcomayî, tiştên  
ku her gav nîvco dimînin hez  
dikim. Tiştên ku ez nîvê wan  
dibînim û dizanim, nîvê dinê jî  
xeyal dikim...

Mêrek hat û li kêleka min rûnişt.

Awirên wî jî mîna awirên min  
di nav ava çem de com bûn. Ev  
mêrik çiqas dişibî min.— belkî  
jî dahatûya min bû ew, ya jî  
rabirdûya min... Me her duyan  
jî li heman dîmenê temaşe  
dikir. Di awirên wî de sekneke  
giran rûniştibû, di awirên min

de sekneke biqaxî... Em ne aîdî  
heman demê bûn. Diheyirîm!  
Dem heman dem bû, lê çawan  
dikarî sîwana xwe ji bo me her  
duyan jî cuda veke... Vegerîm  
kêleka xwe camêr ne li wir bû.

Ji cihê xwe rabûn û min berê  
xwe da pira navendî.

Di nîveka pirê de jinekê çongên  
xwe kutabûn erdê û ji celadê xwe  
lawa dikir. Tu tişt ne di xema  
celêd de bû.

Li çardorê meriv dikenîn, bi hev  
şa dibûn, jînikê lawa dikir, lê ne  
di xema celêd de bû. Tişteki ecêb  
bû vê dîmenê ez hêrs nedikirim,  
bi tenê xemgîniyeke derewîn  
dadigirt dilê min. Min xwe bu  
xwe digot, Hewcebû ev tiştên ku  
diqewimîn di nav rûpelên dîrokê  
de cihê xwe bigirtana, lê na va ye  
em li vir in!

Sal: Piştî zayîne 2025

Cîh: Basel

Û dengê hinava min:

"Evîn ne karê biryarê ye, bi  
carekê re tê û tu dinêrî tu  
evîndar î."

Hêj lawayên jînikê dibihîzim.

Radiwestim.

Dinêrim...– ah dilê min...

dişewite...

Carinan nikarim binivîsim.

Qey dibêjî hemû pey ji min

xeyidî ne, ez jî ji xwe... Bikarim

û ji xwe û ji hertiştî bi dût

kevim belkî dê her tişt rêya xwe

bibîne... Lê bi ku ve? Ez dikarim

ji xwe çiqas bi dût kevim? Cihê

heye ku ez xwe lê veşêrim?...

Gava li tavê dinêrim hinava min

direcive, tav êdî nikare min germ

bike... bi tenê tiştên derewîn ronî

dike û ev jî min zêdetir dieşîne.

Lewma ye min xwe spartiyê

tariyê.

Lê Alîsa hêj li jêr e. Bi axê dilîze.

# Ez aşê sebrê me

her şev  
hestên min yên tevezînok  
di nalîna stranên keserkûr de  
mest dibin  
qedera sersem  
li nav qermîçokên eniya min  
konê xwe vegirtiye  
bêşansiya salên kambax  
xwe li stûyê şadiyên min  
alandiye  
ji asîmanên bihara rengîn  
xwelî û xubar li ser xewnên min  
dibarin  
dilê mesûm  
li nav parsûyên jihevketî  
kutekut e  
alfabeya temen  
di deftera demsalên piştxûz de  
tarûmar bûn  
kovanên mijgirtî  
bi qefesa salên westiyayî ve  
hatine daliqandin  
çirûskên zanyariyê  
di asoya ramanên şêlû de  
direqisin  
li newalên hinavên min  
karwanên sebirê  
derbas dibin  
ez  
li bêxewiya şevên kor  
heyveroniya derûniya xwe me  
li dengvedena kendalên dirinde  
derwêşekî gerok im  
di rêya êş û xeman de

rêwîtiyê dikim  
li aşê serkeftinê  
êşkenceya çaxên genî  
dihêrim  
mucîzeyên jiyana nependî  
di wîzewîza bayê dîn û har de  
kifş dikim  
kelkela birînên kezeba xwe  
bi maçên xunava lêvên yarê  
dikewînim  
şûrê zaliman  
li ber nefsbîçûkî û xweşbîniya  
xwe  
ditewînim  
tenêtiya giyanê xwe yê qefilî  
bi kirasê hêviyên nîvcomayî  
dipêçim  
li nav bagera tirs û endîşeyan  
xwe li siya xeyalên tewîşî  
radigirim  
ji pêşîra rojên bêbext  
meya kêfxweşiyê  
dinoşim  
mîna çiçekên bêhnxweş  
di qelşa qolincên zinaran de  
dipişkivim  
û geş dibim  
ez ê  
wek volqanên serhêldêr  
biteqim  
û di mêjiyê xêrnexwazan de  
agir bipijiqînim

Xizan Şîlan

# Muzexana Qazî Mihemed

Mehtab Îdelî

Siyasetmedar û nivîskarê kurd Mahmud Alinak di 13ê tîrmeha 2025an de li gundê xwe Mewrekê yê navçeya Dîgorê ya Qersê, bi navê damezirînerê *Komara Kurdistanê Qazî Mihemed, mala Muze û Çandê ya Qazî Mihemed* vekir. Ev sazî jîyan û xebata Qazî Mihemed bi bîr tîne. Di muzeyê de ji bilî tiştên şexsî, belge û nivîsên li ser dîroka berxwedana kurdan jî tê de hene.

M Mahmud Alinak bi derfetên xwe yê şexsî dest bi projeyê kir û di nav salekê de tamam kir.

Gelek mêvan beşdarî merasîma vekirinê bûn, di nav wan de nivîskar, siyasetmedar û gelek kesên din ên eleqader hebûn.

Bê guman, pêkhatina merasîma vekirinê di salvegera Komkujiya Zîlanê de ne tesaduf bû. Mahmud Alinak di axaftina xwe de tekez kir ku muza ne tenê Qazî Mihemed, lê di heman demê de êşa bihevbeşî(kollektîf) a Kurdan jî bi bîr tîne. Îro li vir alayek reş ba dibe. Ev xanî cihekî şîne ye, ji

bo Qoçgirî, Zîlan, Agirî, Helebce, Robozikê û komkujiyên di jêzemînên mirinê yê Cizîr de. Ev xaniyek şîne ye ji bo hemû şehîdan e. Şîna Qazî Mihemed, Seyîd Riza, Şex Saîd, Elî Şer, Îhsan Nûrî Paşa, Mele Mistefa û yê din. Lewma ev der bibe ziyeratgeha me. Û tenê bi Kurdistaneke azad, ala reş dê were daxistin û li şûna wê rengên kesk, sor û zer werin danîn.

Di sedsala 21an de, muzexane wek navendên parastin û belavkirina çand û dîrokê roleke girîng dilîzin. Ji bo kurdan, ew realîte bi qasî ku girîng e, ewqas jî taybet û watedar e. Muzaxaneyên wek muzexaneya Ehmedê Xanî, muzexana Mem û Zîn û muzexana Helebce her sal bi hezaran serdanan li xwe kom dikin û wek nevendên hafîzeyê civakî kar dikin.

Muzexana Ehmedê Xanî; Xezîneyê wêjeya kurdî ye. Ew yekem bi navê helbestvanekî kurd hatiye navdarkirin û li vir pirtûkên destnivîs, nusxeyên kevn ên "Mem û Zîn"ê û belgeyên dîrokî hatine berhevkirin.



Mehmud Alinak, di vekirina muzexaneyê de, 13.07.2025

Muzexana Mem û Zînê; Şahi-  
ya evînê û Berxwedanê ye. "Mem  
û Zîn" ne tenê çîrokeke evînê ye,  
lê di heman demê de şahiya berx-  
wadana miletê kurd e. Muzexana  
Mem û Zîn vê rastiyê bi awayekî  
hûrgulî nîşan dide. Li vir, ne tenê  
çîroka Mem û Zîn, lê jiyana civakî,  
çandî û siyasî ya sedsala 17an a  
Kurdistanê tê behs kirin. Muzexa-  
ne bi rêya model, wêne û belgeyên  
dîrokî nîşan dide ku çawa vê çîroka  
evînê di nav miletê kurd de cih  
girtiye û çawa ew bûye sembola  
berxwedanê li dijî zilm û zordarî yê.

Muzexana Helebce; Bîranînên  
zilm û hêza berxwedanê ye. Li  
vir, bîranîna êrîşa kîmyevî ya 16ê

*Ji çemê ku hesp vedixwe, avê vexwe*

*Nivîna xwe li cihê ku pisik radikeve deyne*

*Li cihê ku kormîşk dikole, dara biçîne*

*Li cihê ku mar ji bo ku xwe germ bike mexel tê, mala xwe ava bike*

*Dûrî Tirk, Ereb û Farisan û li ser dilê Qazî Mihemed welatekî ava bike,  
tenê wê demê tu dê ji ezabê vê dinyayê xelas bibî.*

Adarê 1988an hatiye parastin.  
Serlêdanên vê muzaxaneyê bi he-  
zaran wêne, belge û şahidîyên  
jiyanî ra rû bi rû dimînin. Ev mu-  
zexane nîşan dide ku miletê kurd  
çawa di roja herî tarî de jî hêza xwe  
ya berxwedanê wenda nekiriye.

Em ji bo xebateke veng  
pêşeng spasiya rêzdar Mehmud  
Alinak dikin. Her wekî wî got,  
em hêvî dikin ku ev muzexane,  
ligel bîranînên Qazî Mihemed,  
ji bo çar perçeyên Kurdistanê  
bibe bîrake(hafize) hevpar. Bi vê  
ra, serdemeke nû dest pê bike û  
sazî û rêxistinên bi vî rengî bêtir  
werin zêdekirin û piştgirîkirin.

# Tansiyon

Dîlan Şewqî

Rojê dest bi meşa xwe kir  
ez aciz im  
Li vî bajarê bêxwê tenêbûn zindan e  
Tu bi ku de herî goristanek e ku sebra meriv lê nayê  
Off bavo, heya mirina te li dûrî vê derê bû  
Şefeq dikene, bêkesayetî payîza dilê min e ku ew jî temendirêj e  
Ev çî roj in  
çî beroj in ku kevok dûrî wê difirin  
Bayê vir kerafî ye  
mala terezê ye  
Eza ku her tiştê min heye ez bêyî her tiştî me  
Rok bêdeng li dora mala min digere  
ronî dide her tiştî û nade dilê min  
heya pez li vir bêdeng diçêrin  
şev ji bo razanê tê  
Ez aciz im  
bêhna min ji gewriya zarokekî tengtir e  
Weeww ji kengî de bêhna min teng e  
ji kengî de ez ne ji vir im  
Naxwe wekî van pirtûkên xwe ez jî fêrî tozê bûme  
Li vê derê kurmançî wekî dermanê tansiyonê ye pîr û kal bi kar  
tînin  
Ez di nava pêlên evînê de li ber xwe didim  
Navê kurdî li vir tune  
Ez aciz im  
Li vê derê meriv lal be yan dîn be  
mafê meriv parastî ye  
Xelk li vir ji bo zikê xwe dijî  
Pere pir in li vê derê  
mizgeft pir in  
axur pir in  
xwaringeh û mafxwir pir in  
merivên vê derê  
kurd û tirk û afxan û ereb salê pêde li çêrê ne

# Dengê bêdewletîya min

-III-

Xoyretînê Mihemmedî Seîd

“Bê welat jî mirov dikare bijî  
Mîna kûçikan  
Mîna kûçikên bêxwedî jî  
Dinya welatê min e  
Mirov dikare bêje  
Mîna utopîstan  
Mîna kûçikên utopîst  
Lê dema ku tu di ber kê re derbas bibî  
Pehîna xwe li te bide  
Biçî ku, herkes kûçikê xwe berra te bide  
Him tukes bêxwedîtiya te qebûl neke  
Him jî tukes li te xwedî dernekeve  
Û li seranserê cîhanê  
Hestiyên berateyeke bêxwedî jî tune be ku tu bikojî  
Wê demê belkî xwediyek û welatek ji te re lazim be  
Ji bo ku tu kûçiktiya xwe bijî!”

Ferîd Xan

Bê dewlet im. darxistinê li Çarçiraya xopan.  
Bêdewletbûna min ji bêdewlet- Me yê bi navê wî zankoyên  
bûna kûçikên di helbesta Ferîd ê azadîyê vekirî bûya.  
bargiran de ne girantir bû.

Heger dewleta me hebûya Bê dewlet im.  
Qazî Mihemmedê me nedihat Xwîn tere ji dilê min. Bayê

xerîbîyê tê ji gundan. Lê (sel) tere di nav kolanên gundan re. Xortbûna min tere mîna sîrîyêk li ber lê. Ez mirim ne xebera gund û gundîyan hebû ne jî xebera kûçîkên gund.

Heger dewleta me hebûya Saîdê Kurdî yê me ne dibû xûlamê tirkan. Ew Bedîûzzaman bû lê niha talan dîkin nav û zîmanê wî.

Bê dewlet im.

Keçîkêk diçû serî çîyan. Di çeka xwe de gulek digeland.

Heger dewleta me hebûya keçîkên me li bazarên xwînxwarên Daeşê da nedihatî firotin. Namûsa kurdan dihat firotin. Ewr û ajal digîrin bi halê me.

Bê dewlet im.

Rewşa min ji ya Anna Frank ne baştir e. Li ber derîyên me te nîvisandin *“Arbeit macht frei”*.

Heger dewleta me hebûya em nedihatî şewitandin wek cîhûyên Ewropê di firinên nazîstan de.

Bê dewlet im.

Porê reş û bi şîrît, biskên şûştî dixemlînin xewnên min. Bûka paş perdê jî hat kûştin. Gund vala bûn. Jîyan jî vala bû.

Heger dewleta me hebûya wê demê wek lawê xocê gundê me yê Quran kursê him nanê gundê me nedixwar û pişt re jî tecavûza keç û bûkên me nedikir li leşkerîya xwe li Kurdistanê.


Heger dewleta me hebûya dadgeh û girtîgehên tirk û ereb û eceman nedibû malên me kurdan.

Heger dewleta me hebûya mîna kûçîkên helbesta Ferîd ti kesî em pîn nedikirin.

# DÎROKA HUNERA TEVNÊ, XALÎ Û KURD

- III -

Muzaffer Özgür



Çavkani: TEVN- Muzaffer Özgür, birnebûn, Hejmar 2, Rûpel 13 / Amedekar: Simoyê Herşid. Xêzkar: Zaza

## KÊLÎM, KÎLÎM, GELT

Gelt (=kêlîm, gotina gelt li nav Kurdên Anatolîyê tê bi kar anîn. Ez ê di nivisa xwe de ji bo gotina kîlîm, bi nav kirina gelt bikar bînim). Bi destpêka tevna geld çekirinê re hunerek hatîye afirandin. Bi vê jî dest bi hunera tevnê hatîye kirin. Gelt,

wek amûrekî cihê lê dijîn bixemlînin, xwe ji serma biparêzin hatiyê bî kar anîn.

Gotina kêlîm/kîlîm di ferhanga etîmolojîk ya zimanê tirkî de (İsmet Zeki Eyüpoğlu) nivisandîye: Ji gotina zimanê farsî gelîm, gilîm têye, gotinêka farsîye. Di zimanê kurdî de



Ji Anatoliya Navîn - Çal

kêlîm te vateya; kîlîm, cil, ber, merş, gelt, tejik, astir, cacim.

Di kurdî da jî gotina **kêl** heye. Tê maneya **dirûn ê**. Mamoste Îkram Îşler di pirtûka xwe de (*Felsefî ve Mitolojik Açından Kürt Halı ve Kilim Desenleri /Sitav–2021– Van*) li ser etîmîlojîya

gotina Kêlîm de nivisandîye, “...di kurdî de kelîmeya kêl heye. .... di tevna geltê de ji bo her girekê kêl tê gotin.”

Di Îlyada Homeros ta hatiyê nivisîn; ... Akîlleus ew dawetî hundirê male kirin û ew li ser geltên sor rûnişkandin da...



Foto: Gelt-Jî Samsûrê- ji arşîva min



Ji Afrînê– Gelt



Ji Anatolîya Navîn– Ber

Qehreman Dîodemes jî li ser postekî gayê bejî raza bû. Dî bin serê wî de jî gelteka baş hatibû rêxistin. *Homeros, Îlyada (wergera tirkî; A. Erhat, A. Kadîr weşanên Sander, Istanbul 1975, rûpel 243– 263.)*

Tapates ên Frîgya di dîrokê de gelek hatine naskirin. Arkeologa di kolandin û lêgerîna Trûva de bêşek gelt derxistine holê û ew bi BZ. 2400 sal bi nav kirine. Îskenderê Mezin erîşî Anatolîyê dike û welatê Frîga dike bindestê xwe, du re jî derbasî Medyayê di-be û li dawîya şer ên mezin dike

bin destê xwe. Dema digêhêje bajarê Persepolîsê bi dewlemedîya wê eceb dimê. Qonax û qesr bi gelt û xalîyan hatibûne xemilandin. Te gotin ku we demê gelt bê gire dihatina honandinê lê bi mori mircana, rengîn dihatina xemilandin. Çend niviskara jî nîvîsandine ku bi zêr jî hatibûne xemilandin.

Honandina Gelt ê di hunera Tevnê ya kurda de cîhekî xwe yê dewlemend heye. Kultûr mejûyê dîroka cîvatêye. Ew jî bi destên keçîk, bûk û dayîkên kurda te honandin. Gelê kurd bê welatbû-

yin û bindestîya xwe, bê xandin û koçberîbûna xwe gire gire li ser gelta Honandîye. Di gelta de jin, bûk û keçikên kurda; dîrok, şer, şahî û şîn, jîyana rojana, qehremanî, hêvî, evîndarî, êş, mirin, erdnîgarî û tabîata lî ser dijî nexş kirîye.

Geltên lî rojhelatê Kurdîstanê hatînê honandin li dinyayê gelek tên nasîn. Kêlîm ê SÎNÎ pir navdarin. Navdariya geltên SÎNÎ ji honandin, ben, reng û neqş ên we têye. Bi taybetîyên xwe geltên Çolemerîk û Wan ê jî namdarin.

Kurda bi sedan nav li motîvên gelta kirine. Carcaran, bi navê motîvê we, kesen navê honandî,


coxrafya, eşîr, malbat, gund û yê din. Navên sereke yê geltên kurda jî ev in; Bûk, Xemgîn, Sînî, Lûleper, Gulo Sor, Canbêzar, Gulgewer, Şimkobûq, hevneker, Hezar Nexş, Sûmax, Hêrkî, Cecîm, Lop, Kesnekêr, Gulvanî, Gulgavan, Gulsarya, Şahvanî, Şamarî ne.

Jîyan di rengên gelt an de hatiye rêxistin. Rengê sereke Sor e. Reş, şîn, gewr, zer, spî, kesk, qehweyî rengên din in. Her rengêkî maneyeka xwe heye. Boyaxa hatî bikar anîn jî nebatîye.

Çend neqşên geltên kurda\*



\*Çavkanî: Van Kilims ( Amadekar: Van Valiligi, 1998– Ankara)



# Doza mirinê di destana Gilgamiş de

Salih Bozan

**D**estana Gilgamiş giringtirîn destan e di wêjeya cihanî de. Girîngiya wê ya yekem, gelek kevna e; ya duyem, pêga yekem e di ware pêvejoya zanahiya mirovahiyê de, û ya sêyem, helbesta yekem e di dîroka wêjeyê de. Zanyarê rusî Aleksander Nemîrovskî dibêje ev destana xezîneya helbestê ye ya li welatê Mezobotamiya.

Destana bi temamî ne li dervayî dîrokê ye. Eynî ku dema destanê ne sînor kirîye, lê bi rastî mirovek bi navê Gilgamiş di dîroka gelê somerî de hebû. Ew şahê pêncemîn ê somerî bû. Piştî mirina wî, helbest, stran û çîrokên gelêrî li ser hatin aferandin. Lê destana ku gihîştîye me, ne bi temamî li ser Gilgamişê rastînî ye, a bi piranî li ser Gilgamişê efsaneyî ye.

Zanyarên ewropî xuya dikin ku ev destana ji nav gelê somerî derket, lê nivîskarê Akkadî yê destana

gihîşte me, wî ji nû ve afirand û mijarên wê bi hevdu re girêdayî kirin. Di wê demê de, ev destan li rojhilata navîn berfireh belav bû û hat wergerandina zimanên din. Hinek beşên wê bi zimanê hittitî li Anadolê hatin dîtîn, hinek parçe jî bi zimanê horî hatin dîtîn. Heta gihîşte Filastîna kevna. Li bajarê „Mecdo“ yê Filastîne hinek beşên wê hatin dîtîn. <sup>(1)</sup>

Bi nêrîna min, sedema vê werger û belavbûnê ew bû ku gelên wê demê gişt weha diramiyan û bawer dikirin. Mijarên destanê di sewdan(aqil) û endîşeyên wan de zayîn dibûn. Bi gotineke din, wan gelan xwe di vê destanê de didîtîn. <sup>(2)</sup>

Gelek dozên felsefî di destanê de hene. Lê ya tewre girîng doza jiyana û mirinê ye. Girîngiya vê dozê jî ji ber ku cara yekem mirov di dîroka zanahiyê de li wateya jiyana û mirinê digere. Du nêrînan li ser doza mirinê di destanê

de hene. Nêrîna Enkîdi û nêrîna  
Gilgamiş.

Nêrîna Enkîdo nêrîneke pisko-  
lojî ye, lê nêrîna Gilgamiş felsefî  
ye. Lewra em dibînin Gilgamiş  
li ser doza mirinê weke fêloso-  
fevanek derdikeve. Wî biryara  
Yezdanan ku mirin kirin para  
mirovan û cawîdanî ji xwe re bi-  
rin nepejirand. Enkîdo jî serê xwe  
ji mirin û Yezdanan re daxist û

Lo deriyo...

Ku min bizanibûya

ev rewşa dê ya min be

Yê ku te bîne, dê ev bêtara ser de were

Min ê tevirê xwe rakira û tu hûrî bikira,

Min ê ji te keştiyek çêkira.

Ez ê niha çi bikim?

Min tu çêkirî û hanî,

Dê siba kiralek li pey min were,

te bikar bîne.

Navê min ji ser te rake

û navê xwe deyiîne.<sup>(3)</sup>

Di gotinên Enkîdo de em rewşa  
hemû mirovê li ber mirinê  
dibînin. Ew rewşa me giştî ye.  
Mirov, li ber mirinê, digihêje  
xemgîneke tewre tîr. Li ser jiyana  
ku li ber çavan vedimire û dike-  
ve reşbîneyeke eletewş (absurd).  
Enkîdo gazinên xwe bi Yezdanan

dîlok li ser çarenûsa xwe gotin.

Weke jin ta niha dîlokan li ser  
miriyan dibêjin. Ev tê wateya  
ku dîlokbêjê yekem di dîroka  
ademîzadiyê de Enkîdo ye. Ew  
tenê xwe di xaniyekî de û li ser  
textê xwe rû bi rû li hember mi-  
rinê sekenî. Kes li hawirdorê nîne  
ku pê re baxife, lewra bi deriyê  
xaniyê xwe re diaxife:

nake, li ber wan dernakeve. Ji ber  
ku dizane biryara Yezdanan ne  
guhanbar e. Em di gotinên Enkî-  
do de tiştêkî balkêş din dibînin.  
Ew rewşa mirov di duhmeka  
mirinê de bi zelalî ji Gilgamiş re  
şîrove dike:

Dosto...

Şeva çûnî min xewnek dît,  
Ezman bi tavan dîkir himînî,  
Zemîn jî wisa lê vedigerand.  
Ez bi tenê xwe sekinîbûm,  
Li hember min aferîdeyek derket,  
Samdar bû, rû lihevketî bû.  
Rû yê wî wekî rû yê balefirê birûskê Zo bû <sup>(4)</sup>  
Pençeyên wî weke pençeyên qertelan bû.  
Ez ji cilan tazî kirim,  
Bi penceyên xwe ez girtim,  
Ez guvaştim ta nefes li min çikiya.  
Li min nihêrî û ez birim warê taristana Arkêla. <sup>(5)</sup>

Mirovên kevnar berî olên giştigirî bawer dikirin ku aferîdeyek heye giyanê ji gewdeyê mirov dikişîne, lewra dimire. Rû yê wî lihevketî ye, gelek samdar e. herweha, em dibînin ku rûyê Zo û yê Ezrahîl wekî hevdu ne. Enkîdo dibêje wî ez kirim nav pençeyên xwe û ez fetisandim, ango nefesa kişand. Ezrahîl jîm gor îslamê, giyanê mirov bi çenxelekê ji gewdeyê wî dikişîne û di pozê wî re derdixe.

Warê kî dikeve wir, venagere  
Rê ya kî tê re dimeşe, vegeer paş de nîn e  
Warê ronahî ji nişteciyan re qedexe ye  
Ax û celb xwarina wan e  
Di tariyê de dijîn  
Ronahiyê nabînin. <sup>(6)</sup>

Enkîdo cara yekem di dîroka zaniya mirovahiyê de li ser cihana miriyan (cihana din) diaxife. Enkîdo, berî olên giştigirî, têgeha cihaneke din, diaferîne. Lê gor xewna Enkîdo li cihana miriyan bihuşt nîne. Tenê dogeh heye. Enkîdo rê li hêviyên miriyan dibire û weha li ser warê miriyan diaxive:

Lê doza mirinê li cem Gilgamiş mijareke din e. Gilgamiş bi nêrîneke fêlosofî li mirinê dinihêre. Mirina Enkîdo bû jêdera ramyarî ne tenê li ser mirinê, lê belê li ser jiyana û cawîdanê jî.

Gilgamiş ji xwe dipirse: « Ev çi xew e ku şeş roj in Enkîdo jê hişyar nabe?» Lê gava dibîne ku kurim ji bêvilên Enkîdo derdikevin, ew dike hawar. Ev hawara wî serkîşiyêke dilsuz a mirov di jî mirinê ye. Pirsê Gilgamiş li vir ev e: „Ev çi rewşêke ne nas e?„

Bi rastî em di destanê de du Gilgamiş dibînin: Gilgamişê şoreşger û leheng, ku Xembaba û gayê ezmanî kuşt, û Gilgamişê tirajîdî yê di mirina Enkîdo de mirina hemû mirovan dibîne. Herweha pirsên fêlosofî ji sewdanê wî dipijiqîn: „Çima mirov dimire? Çima ji cawîdanê bê par e?“

Sûra ku di navbera herdu Gilgamişan de lêbû, ew bi mirina Enkîdo de girêda ye. Jiyan li ber çavê wî bê wate bû. Çawa lengekî wekî wî, dê bimire û biçê warê miriyan.

Piştî ku Gilgamiş bi dostê xwe Enkîdo binax dike, ew li ser jiyana,

mirin û cawîdanê kûr û dirêj dirame. Dixwaze wateyekê di jiyana mirovan de li ser zemîn bibîne.

Em kanin bibêjin Gilgamiş di doza mirinê de ne li ser çarenûsa xwe tîne mijûl dibe, belê li ser çarenûsa her mirovekî. Bi gotîneke din, ku çareseriyekê ji mirina xwe re bibîne, wê çaxê ademîzadiyê ji vê dawîya tarî rizgar dike.

Di kultûra mezobotamiya ya kevnar de, mirovan hewil didan bi alîkariya Yezdanan ji rizgar bibin. Dr. Husên Owêdat dibêje: „Tîrsa mirovê wê demê ji mirinê ew bû, ku nikane çareyekê jê re bibîne. Doza mirinê li ber çavên mirov bû pîrsgirêkeke samdar.“<sup>(7)</sup>

Lê Gilgamiş dizanibû ku çareserî ji Yezdanan nayê girtin. Çimkî ew di paş mirina mirov de ne. Çirûskeke êşixî di bûyereke kevnar de dibîne. Di lehengê Tofana Mezin Uto– Nibiştîm de dibîne. Çawa vi mirovî kanibû biryara Yezdanan li ser istiyê xwe pûç bikira û cawîdanî bidestxista.

Herweha, berê xwe dide Uto– Nibiştîm. Lê ew li ku ye? Kes warê wî nas nake. Û bê rêber Gilgamiş dikeve rêwîtiya dirêj.

Di vê rêwêtiyê de, Gilgamiş Sîdorî rast tê û rêya Uto– Nibiş-  
bi temamî me dike kesayetiya tim jê dipirse, dilê Sîdorî bi rewşa  
efsangerî. Bi gotineke din, ew di wî dişewite û dixwaze wî hişyar  
cihana efsanê de diçe ne di cihan bike ku hêviya cawîdanê ji miro-  
na helkewtî. Çi bi rê ve dibîne ew van re leylan e. Bi xemgînî jê re  
li dervayî cihana wî ya li bajarê dibêje:  
Urokê ye. Gava li jina meyxanê

Tu kuda diçî Gilgamişo...  
Jiyana tu lê digerî tu nabînî.  
Gava Yezdanan mirov aferandin,  
Mirin kirin para wan,  
Û jiyana cawîdanê ji xwe re birin.  
Gilgamişo...  
Here zikê xwe bi xwarinê tijike,  
Bi ro û şev bextewr bibe.  
Di her rojeke xwe de şahiyê ava bike.  
Bi ro û şev bazde û bilîze.  
Bira, cilên te pak bin û xemlandî bin.  
Serî û canê xwe bişo.  
Kurê te, yê bi destê te digire bihebîne.  
Jina di hembêza te de bextewer bike.  
Ev para mirovan ji jiyane ye. <sup>(8)</sup>

Sîdorî bersivên felsefî dide û di rê ya xwe de diçe ta digihêje  
Gilgamiş. Wî bi wateya jiyane Uto– Nibiştin. Li vir Gilgamiş  
naskirin dide, û doza mirin û rewşa xwe bi jankêşî ji Uto–  
cawîdanê ji kokê de jê re şîrove Nibiştin re rava dike, sedama  
dike. Gor Sîdorî, ev herdu dozan hatina xwe diyar dike û weha li ber  
bi Yezdanan de girêdayî ne. Lê Oto– Nibiştin diaxife:  
Gilgamiş guh nade gotinên wê,

Dostê min...

Hogirê ku min jê pir hej dikir,  
Ê di hemû diwariyê de bi min re bû  
Ew di rê ya mirinê de çû  
Seş rojan û heft şevan ez li ser giriyam  
Min nekire gorê,  
heta kurim li ser rû yê wî derketin  
Mirinê ez bizdandim, ta bi çolê ketim  
Bê tara ku ser dostê min de hat  
bi giranî li ser sîngê min rûnişt. <sup>(9)</sup>

Lê Uto—nibiştim aveke sar ser de din dubare dike. Lê dinihêre weha dirijîne. Gotinên Sîdorî bi awayekî jê re dibêje:

Mirin zalim e,  
Mihrevaniyê nake.  
Herku em xaniyekî lêdikin, ma sermedî dimîne?  
Herku em peymanekê mor dikin,  
ma ta hetahetayê berdewam dike?  
Ma bira malmîrata ku li xwe parve dikin,  
dirêjîya dewranan dimîne?  
Ma zikreşî li ser zemîn ta berdewam dimîne?  
Ma ava çem radibe û tim lehî tê?  
Her ku pirpirok ji kevlojankê derdikeve û royê dibîne,  
di cida namire?  
Berdewamî û cawidanî  
ji berê de tineye.  
Çendîn xew û mirin wek hev in.  
Gava mirina mîrza û reben tê,  
kî kane cudahiyê di navbera wan de bibîne?  
Anonakî <sup>(10)</sup> û Yezdanên mezin  
ji mêj ve li hevdu civiyan,

Mamtim jî bi wan re bû <sup>(11)</sup>  
Ew yên ku qeder peyda kirin,  
Ew yên çarenûs bêlikirin,  
Mirin û jiyana parve kirin. <sup>(12)</sup>  
Lê roja mirinê diyar nekirin. <sup>(13)</sup>

Di destana Gilgamiş de em dibînin ku ew bi jiyana xwe ya li bajarê Urokê bextewer bû. Jiyan li cem wî, herçiqas bedew û bê hempa bû. Lê gava Enkîdo li ber çavan ji jiyane derdikeve, ew dişemite rewşeke trajîdî. Ev tirajîdiya di sewdanê wî de berde-  
wam dibe.

Mirina Enkîdo Gilgamiş neçar kir ku serkêş dijî Yezdanan derkeve. Destana “Eferandin û bûneweriyê” ya bi navnîşana “Înoma– Îlîş” (Du hezar sal b.z.) aşkere dike ku Yezdanan di civîneke xwe de biryar girtin ku mirovan bafirînin ji bo xizmete wan bikin. Jiyan dan wan ji bo berdewam di vê xizmetê de bin. Lê Yezdanan dizanibûn ku ew nikanin azweriya mirovan ji bo azadiyê asteng bikin. Dê rojek were, mirov li hember Yezdanan derkevin û azadiya xwe bixwazin. Lewra Yezdanan jiyana mirov ki-

rin jiyaneke demkî. Lewra, mirin danîn ser milê wan û ew ji cawîdanê bê par kirin. <sup>(14)</sup>

Jina meyxanê jî weha ji Gilgamiş re rava kir. Bi gotineke din, Yezdanan mirov bi mirinê merbend kirin. Dem ji mirovan re nine ku bi serkêşiyê dijî Yezdanan biserkevin. Gava em digihêjin hersê olê giştgirî, em di pirtûkên pîroz de aşkere dixwînin ku Yezdanê Tenha mirov aferand ji bo bibe rebênê wî. Bi gotineke din mirov ji rebeniyê re hat aferandin. Di Kuranê de ev ramana pir dubare dibe.

Ger Yezdanan (Yezdanê Tenha) mirin nekirina para mirovan, wê çaxê mirovan rebenî li ser xwe nedipejirand. Iblîs rikî xwe kire rikî Yezdanê Tenha ji berku dizanibû ta Roja Qiyametê namire. Serkêşiya Iblîs li hember Yezdanê Tenha di du qonaxan re derbas bû. Di her qonaxekê de bi cureyekî Iblîs bi Yezdan re di-  
axive. Siftehîn bi Yezdan re got, ez ji Adem re danakevim sicdeyê, ji ber ku ez jê çêtir im. Ez bi zanistiyê jê zanetir im, pêwendiya min bi te re, ji ya wî kevintir e.

Di vê qonaxê de Ibgîs giraniyê didide ser raman û lojîkê. Lê gava Yezdan daxwaza wî ji bo ta Roja Qiyametê bimîne dipejirîne, wê çaxê Iblîs bi tonekî din, bi Yezdan re daxive. Ew aşkere serkêş li hember derdikeve û bi Yezdan re dikeve hevrikiyê.<sup>(15)</sup>

Em dikanin bibêjin ku Yezdanan (Yezdanê Tenha) mirov nekirina bin nîrê mirinê, mirovan ev rebeniya bê sînor ji Yezdanan re nedikir, û li pey pêxemberan korkanî nediçûn. Lewra rastiyeke mezin di gotina Fêlosof û dîroknas W. J. Durant (1885– 1981) de heye, gava dibêje: «Mirin maka olan e.»

Li dawiyê ez dixwazim bibêjim çiqas zanyarên jiyanelogiyê, ontologiyê û Anthropologiyê doza mirinê bi zanistiya nûdem şîrove dikin, û dibêjin mirin bi ti Yezdanan de negirêda ye, lê ev doza di derûna mirov de dê bimîne. Ji Gilgamiş û Enkîdo de mirin kete derûna mirov, û em texmîn nakin rojekê bi hêsanî jê derkeve.

Nifiş li peyî nifişê dê li Destana Gilgamiş vegere, ji bo pêga xwe ya zanahiyê ya yekem di vê dozê de bibîne. Ji bo bizanibe, naskirina vê dozê çî hanî serê mirov.

Herweha di her mirovekî de Gilgamişek heye û Enkîdoyek heye.

## Jêder

1. Taha Baqir. Malper: www.A.com, bi zimanê erebî, rûpel. 10. *Bajarê Mecdo di Tewratê de navdar e.*
2. Xwendevan kane berfireh li ser vê mijarê vegere pirtûka „Olên Rojhilata Navîn“. Les religions du proche– Orient asiatique) Wergera erebî Mufîd Ernûq. Dar Ela El– dîn. Çapa duyem Surî– Damask 2006.
3. Taha Baqir, rûpel 54.
4. Zo: *Balindeyê biroskê ye, di efsanên Êrakê yên kevnar de.*
5. Taha Baqir, rûpel. 57. Arkêla: Navê Yezdanekî cihana jêrîn e
6. Firas Sewah, rûpel 176.
7. Dr. Husên Owêdat: Mirin di olên rojhilatî de. Çapa yekem. Dar El– fikir. Damask 1986, rûpel 22.
8. Taha Baqir, rûpel 64.
9. Taha Baqir, rûpel 68.
10. Ananokî: *Girûpek Yezdanên cihana jêrîn in. Ew li wê cihanê dadweriyê dikin.*
11. Mamtim: *Yezdanê ku Qeder û çarenûsa mirovan bîsnorkirin.*
12. Di Tewratê de weha Yezdan dibêje: „Binihêrin: *Min hîro jîyan û xêr, mirin û şer danî pêş we*“. Duyetî 30/ 15.
13. Taha Baqir, rûpel 68– 69.
14. Destana „Eferandin û bûneweriyê“. PDF
15. Kuran. 38. 71:83

# PAÇO

Halîl Mîrzan Küçükyıldız

**H**evalên min sewa ku min silbikin, ger bi qerf, ger bi şîranî bi min re dibêjin Paço. Ez jî qet nakim xemekê, heta di ber xwe de şadibim, dikenim. Wexte ku dîya min bi civanî çû rehmeta Xwedê, em eznî bûn, bi ezîndarên ku dihatinî şînê re min digot, “min re dibêjin Paço va na-va dîya min bi şîranî li min na.”

Cara siftehî va navûnuçikan li min nan, ez pir pê êşiyam, dilşkeştî, xemgîn bûm. Ez nuha ji we re wê rojê, hetanî hîngê çi hatîyê serî min, çima suva hatim vegotina wê bikim.

Cara yekemîn, ku ez li otobûsê siyar bûm salên min yazdeh bûn. Ez hêndî xortekî ji xwe xweş bûm. Bavê min porê min alabrus kurkirî bû. Şalekî Îskoç ji çoka de bi pînîyên siwarî, mintanekî sor li min; cotek solên naylonî di lingê min de bûn. Ji şabûnê dilê min mina çûçikeka ewran, ku dixweze bifire dikire tîqe tîq di sîngê min de.

Otobûsa gundê Molika /Düz-tepe Otobûseka kevn, bi reng heşinkî, pir qoltixe dirîyayî bû. Ferq nake, dîsa jî lêniştina otobûsê kêf û heyecaneka pir mezin bû ji min re. Çend saetan şunva em hatinî bajêr, ji otobûsê peyabûnî. Bavê min berê em birin dikaneke manufaturê, taximek elbîseyî lacîwerd, du işligên gewr, cotek merasî isqarpînên reş ji min re kirî, paşê got, „atlet û kûlot, pijame, tiştî din ma xaltîya te bistîne, ez ê peranan pêdim, hêndî derpe, kiras tunne, kûlot û atlet, va şalî bi pîne bavêje, taximî xwe li xwe ke here dibistanê.” Ew şora wî pir hat xweşîna min “atlet û kûlot, kiras û derpe hendi tunne!”

Tabîkî ez hatibûm xwendinê, dibistana navin, lîsê li bajêr bixwînim. Mamostayê min a gund pir li ber xwe dabû, “va lawikayî, herhal, mutleqa bixwinê. Pir bi heş e, pir zekî ye, pir jîr e, her tiştî bi cara sifte re dihe-

vîsê, pêşeroja vî lawikî rohnî ye, istikbaleka baş“ Lê belê ez pir pesandim. Va jî, qey pir dilê bavê min hat, pê kêf da, got, “ez ê te biwim ba xaltinîka te li mala wan bimine û here mektebê” Xaltî dûr e dûr merîya me bû, merê xwe ji gundêkî dinî kurmanc, li bajêr pasvan, ya jî memureyeta-ka biçûk bû. Me bixwe re yarên rûn, penêr, mast, pir tişt anîbû û bi seyyareka sêtekerî şandîbû mala wan. Bavê min got; "Debar û aborîya wan ne baş e, hewce ye ku, ez alikarîya wan bikim, tu jî qîret ke bixwine, serî me berjêr meke li hemperî amanca, me fedî kirin me de li ba xelkê, dost û dijminan." Ew şîret, ya jî, daxwazên bavo bûn min hîn jî fahm nekirîyê.

Roja sifteh baş dest pêkir, min çenteyê xweyî kesk û zer girt, çûm textebenda rêza pêşiyê rûniştim. Mamosta xanim ket sinifê û got, "Rojbaş", em gîştik rabûn pê. Dersa yekemîn tirkî/Türkçe bû. Pir kesî hevdû nasdikirin, ger ji mehelle, ger ji dibîstana pêşîn, heval hevalkî rûniştî bûn. Min jî xwe kemişand rêza yekemin. Paşê xanimê şûnên henan guhêrîn, ez jî

rakirim rêza ter paşiyê "Yên dirêj li paşiyê, yê kinik li pêşiyê" got û derbasî xwe naskirinê bû. Ez jî rabûm, nave xwe got, "Xalid Xarmancı." Piqinîk ket sinifê, gî bi min kenîyan. Mamoste xanimê kir qirnî, "hîşbin/susun! bi hevalên xwe qerfa mekin, mekenin, ew hevala hîn hunû ji gund hatiyê." Min hîngê ji wê pir hezkir, xwina min kelîya ser, bi dayîkekê şiband. Tenefûsê derketinê der, gelek zarok bi meraq li dor min gîheştin hev, yêkî navê min pirsî, min got "Xalid Xarmancı", gundê min pirsî, min got "Xabûrxan" Gî dîsa kenîyan. Wî lawikî bi heke hek got, "va yî hîn nikanê navî xwe bêjê" Yekî din got, "Ew kurd e, tirkî çi dizane!" Yê din devê xwe xar kir û got "Lan pîs Kürt bê jî Halit Harmancı nabe?" bi wera beraber kuta çenga min. Ez jî lê sorbûm, mistek avet, didanê wî xûn bû. Lêwîk kir qirnî û berva idarê bezîya... Yek ji idarê biderket, ji me pirsî, ku ew çiyê. Wî lawikî bi kelgirî got, "vî li min xist" Lawikekî din got, "na wî berê dest pêkir kuta vî, dujênî kir, got pîs Kürt" Muallim yek şelmak li me herduya xist,

em şandin sinife xwe. Dûva mamosta xanim hat bi sinife re axaftinaka xwaş û bi mane kir, got “ bi dengkirin û axaftina, bi şikil û şemalê hevalên xwe qerf û heneka mekin, dilî hevdû meşkenin... felan... felan. “Min zanî mamosta vê axaftina nermik û şîrîn boyî min dikê. Paşê mamoste xanimê li tenefûsê bankir, li xewlekê bi min re got, “hêndi wî zimanî tu li mal, li gund dipeyîvî ji qetîyên bîrbike, tenê Tirkî bipeyîve!”

Dora din a rojê min çêr û mirûz re zanî, ku apê Rustem, mêrê xaltîyê tiştêk bîstîyê. Bi hêrsekî tûj, bi dengêkî bilind “carake din nebihîzim tu bi kurdî peyîvî tene tirkî, kurmancîyê çi fêda xwe bi te heyê, zimanê me tirkî ye bes!”

Xaltîyê xwest îtirazke got, “qey ku nebe ma bi min re bi zimanî me dengke, bi va hendik tirkîya min zimanî di devê min de qulot bûyê. Kurikên me ji kê hu bikine?” Apo berva bû “nabe xatûn qetîyet nabe kurdî di vê malê de qedexeyê hendi! Kurikê min jî ma fêrnekin!”

Hingê min him mamos- te xanim jî apê Rustem jî baş

fahm kir, ku ew rindîya min dixwazina, serkevtin, xurtbûn û pêşvaçûyîna min dixwazina. Yajî min veng dizanî bi xwe bi xwe. Min sond xwar, ku careka din kurdî napeyîvim. Li gund jî mamosta kurdî peyîvin qedexe kiribûn, lê dîsa jî li mal, yajî ku em dilîstinî me bi kurdî deng dikir, boyî vê jî me pir caran li mektebê ceza li me radibirîn, ço, sîle, şelmaq.

Herku çû min tirkîya xwe ser- rast kir, ferqa “x” û “h” hevîsî, di dersên xwe de pêşta çûm. Kes bi axaftina min nedikenî, mamosta xanimê ji min hezdikir. Lê, min pir bîra mal, bîra û xangê, dê û bavê, hevalan dikir. Panzdehê sibatê hat rêya gund xuyakir.

Ku ez ji otobûsê peyabûm, dê û bavê min, birayê min î biçûk li nav gund benda min bûn, bi şabûn û coşîyaka mezin me hevdû hembêz, paçkir. Lê, her ku çi dipirsîn min bi tirkî bersiv dida. Dîya min qet fahm nedikir, ez çi dibêjime, pir xemgîn dibû, “Merîv zimanî dê û bavê xwe ji bîr dike? Te heşê xwe windakirine lawê min?” digot. Min biryara xwe dabû, him jî bi sond bûm. Xuşk û birayên min ê

biçûk wergerî dikirin, ew jî diçûn dibistanê hêndi. Ku ez çûm nav gund heval li min qehirîn û bi hêrs hatin. Henan digotin, “qey em jî tirkî dizanin, ema li vir di xwaze em bi zimanî xwe bipeyîvinî. Min qisên hîn neçê, nexwaş jî dibihîstin.” Va vireka çiyê? pozî xwe li hewa girtîyê, fortan dikê, bi tirkîyê xwe hewa diavêjê.” Min li kêlekê listîkê wan qît, sîpan temaşe dikir. Dilî min listîkê bixwaze jî min bixwe bixwe digot, “ez hêndî bajarî me tev van çî bilîzim tirkîya xwe xeraw bikim.” Bi vê şiklê deh roj bihurîn.

Roja yazdeh em bi çend hevalên xwe va li ser sîfrê bûn li mala me, dîya min li hêla me runiştîbû, temaşe dikir û tim di got, “bixwin qurban bixwin, zikî xwe têrbikin!” Min hevalan re qala xwarinên bajêr, lokanta û restauranta dikir bikêfekî xwaş. Navberekê min got, “xwarin xelas bû em destên xwe bi peçetê paqij dikin.” Kesekî peçete çî ye nizanî, pir meraq kirin, li ber min gerîn, ku ez bêjim ew çî ye. Min hîngê sonda xwe xwar

û got, “paç! paçê destan!” minaku min sêcek kiriye pêyv ji devî min şemitî. Heval gîştik kenîyan “Ew tiştêkî hêsan e paç, paço.” Çi jê fahm kir nizamim, dîya min nişkava got “wêe ez qurban paçoyê xwe, min biçûkî canê teyî pir sist bû min bi şîranî digot paçoyê min.” Hevalan kir hîke hîk û dîsa kenîyan, lê li min neçê û bi qehr hat.

Roja dotir, ji hevalan kî rast dihat, bandikir, “paço paço! Ew tirko!” Bîhna min teng bû, xeyîdim, bilez, bi hers bezîyam mal. Minaku hemî gund dû min dikê barni “paço paço!” Şîv jî nexwar, min got, “sibe ez herime bajêr.” Dîya min, “çima ez qurban hîn rojên te hene?” min got, “dersên min pirin, ez mecbûr herim.” Wê evarê dîya min gelek çiqin kirin hev, bavê min sibê zû ez li otobûsê sîyar kirim. Ez suvahatî, xemgîn ji gund veqetîyam. Hîngê canê min pir êşîya, di ber xwe de girîyam girîyam. Dîya min, axx dîya min a şîrin, ezîz te çima ew suravika bi dilê min de berda, çima?

# Kitêbên kurdî yên dersê ji weşanxaneya Apecê



<http://apecpublishing.com>

Besöksadress

Telefon


Mjölmarstigen 1-3

08-761 81 18

S-163 41 Spånga

E-post: [info@apectryck.se](mailto:info@apectryck.se)

DONATIONER  
— VARA MED OCH BIDRA TILL BARNENS FRAMTID —  
ALÏKARÏ  
— TEVLÏ PÊŞEROJA ZAROKAN BIBIN —



TÊKILÏ / KONTAKTA OSS  
Mjölmarstigen 1, 163 41 Spånga,  
Stockholm, Sweden  
E- mail: [info@stiftelsenkan.com](mailto:info@stiftelsenkan.com)

Hevkarên me / Våra samarbetsparner



Folkuniversitetet Gävleborg  
Drottninggatan 10, 803 20 Gävle



ABF Botkyrka– Salem  
Hallunda